

...naverok

Sergotar

Dosye: Ehmed Huseynî

Em neviyên têkçûnên pir mezin in / Hevpeyvîn bi Ehmed Huseynî re

Pirsên Gîrokî / Ehmed Huseynî

Sebarek Bi Ehmedê Huseynî, Bi Duh û Îroya Xwe Ve

Pêşkek Li Ser Pêwendiya Şoresê û Wêjeya Kurdî / Kawa Nemir

Nalîneke Xwîşîrîn: Berken Bereh

Ehmed Huseynî / Îrfan Amîda

Ji Bo Poetikaya Ehmed Huseynî Pêncî û Yek Deqdeqûsk (1955 - ...) / Lal Laleş

Şevbaş ey şev! / Ehmed Huseynî

Ehmedê Huseynî-Şêxê helbestvanên Kurd / Sebrî Silêvanî

Ehmedo Ronî (di ser Diyarbekirê re ji Ehmedê Huseynî re nameyek) / Ferîd Xan

Ehmedê Huseynî û beşdariya zimanê Kurdî di mîratgiriya mirovatîyê de / Xelat Ehmed

Helbest, ku ji hisûtîna pirsan û wêdetir diçe / Hoşeng Broka

Şêx Ehmedê Huseynî / Ezîz Xemcivîn

Wek mirinê tu bi lêv dibî! / Ehmed Huseynî

Em ê çawa vê birînê bi hev bidin nasîn û xewnê şîrove bikin? / Mem Mîrxan

Qutbê Helbestê / Adar Jîyan

Kovara **W**

Kovara Dumehane

Hejmar X

Adar-Avrêl 2006

Xwedî û Berpirsiyara Nivîsaran:

Rojîn Tûrkekul

Editor: Dilawer Zeraq

Mîzanpaj û Dizayna Hunerî: Şener Özmen

Şewirmendê Hiqûqê: Av. Muharrem Erbey

Navnîşan: İnönü cad. Magül iş hanı No: 60

Diyarbakır

Çapxane:Gün Matbaacılık/0212580 63 80

e-mail:kovaraw@yahoo.com, kovaraw@hotmail.com

Web: www.kovaraw.com

Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin

li xwediyê wê nayê vegerandin.

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Şertên Abonetiyê:

Nava Welêt, Salek: 20.YTL

Welatên Dereke, Salek: 80 Euro

Banke:

Rojîn Tûrkekul

Ziraat Bankası Merkez Şubesi/ Diyarbakır

Nimroya Hesabê Bankayê:

TL: 101 27 71

Euro: 1044279



EHMED HUSEYNÎ

Ji bo miletekî hin nivîskar hene ku ji nivîskariyê wêdetir afirînerên zimanê wî mîletî ne. Ew mîlet mecbûr e ku li hêviya deng û peyvên wan nivîskaran be. Lewra deriyên gotin û vegotina zimên vedikin. Bi bikaranîna peyvan û cureyên vegotinan banekiyên wî mîletî hildiweşînin. Zimanê wan ên ku pê diafirînin, dibe zimanê neteweyekê ku ew netew dikare xwe pê paye bike. Wekî Sheakespeare, Cervantes, Yaşar Kemal, Nazım Hikmet û hwd.


Ehmed Huseynî jî yek ji wan nivîskaran e ku afirînerê zimanekî xwerû ye ku kurd îro dikarin xwe pê paye bikin. Hemû sînorên vegotina zimanê kurdî ji holê rakirîye, ziman kirîye hespê rehwanî ku rişme ji siwariyê xwe stendiye û azad dibeze. Ehmed Huseynî ruhekî nû daye kurdiya li ber sikratê. Lewra jî, dibe ku mirov nikaribe bibêje Ehmed Huseynî xwedayê zimanê kurdî ye, lê mirov dikare bibêje ku, Huseynî tegez pêxemberê zimanê kurdî ya nûjen e.

Ji bo hin neteweyan nivîskarin hene ku hemû ruhê rabirdû û dahatûya zimanê ku bîra wan qutqutkî û belawela bûne, di tîna hubra xwe de dinimînin. Lewra jî mirov tê dernaxe ku ew ziman çend caran mirîye û dîsa zîndî bûye. Bi rewş û xemla xwe, bi kamilbûyîn û stewiyayîbûna xwe, hemû êşên rabirdûya xwe didin jibîrkirin. Ehmed Huseynî jî yek ji wan nivîskaran e ku bi zimanê xwe yî kamilbûyî demên windabûyî yên kurdî dide jibîrkirin. Lewra jî him diran di devê zimanê Huseynî de nemane, him xortekî çalak û qeşeng e û him jî zarokekî ku tama şîr ji dev tê ye.

Û hin helbestkar hene ku li ser girên rût, li bihuştê welatê helbestê bi çilekî dinêrin. Hin helbestkar hene ku li welatê helbestê di aşîkiyên êretî de xizaniyê dikevîjin. Hin helbestkar jî hene ku li ser textê paytexta welatê helbestê, bi bextê bestê dijîn ku wijdanê helbestê dinimînin. Ehmed Huseynî jî yek ji wan helbestkaran e ku li ser textê paytexta welatê helbesta kurdî bi serbilindî û bibext rûdinê. Û wijdanê helbesta kurdî dinimîne.

Û divê ev netew tegez wan nivîskaran wekî rûmeta zimên bipejirînin û deriyê dîroka xwe û wêjeya xwe ji wan nivîskaran re vekin. Ji loma jî me xwest di vê hejmarê de em "BEXTÊ HELBESTA KURDÎ" Ehmed Huseynî bikin mijara vê dosyeyê û ji bilî wî û peyva wî bi tu tiştekî din ji nexemilînin. Fermo xwe bispêrin bextê wî û helbesta wî.

Kovara W



Em neviyên têkçûnên pir mezin in


Hevpeyvîn: Şêxmûs Sefer

Şêxmûs Sefer: Tu çima dinivîsînî?

Ehmed Huseynî: Da ku ez bi awayekî ji awayan hebûna xwe hest bikim, ji xwe nerevim, madê xwe ji xwe û ji derdorê û ji jiyane nexelînim.

Her ku min gotinek dinivîsand, min li dahola cengekê dixist û min şerekî bêsûde bi xwe re, bi hevalên xwe re, bi xewnên xwe re, bi laşê xwe re dikir. Min dixwest û hê ji dixwazim ku hêdî hêdî rastiye nas bikim, rût bikim û di nav destê xwe de biguvêsim û xwe ji tiştêkî ku di navbera mirin û dînbûnê de diçe û tê biparêzim.

Dinivîsînî da ku naveroka êşa xwe, bejna bindestiya xwe, sirûdên têkçûna xwe û birînên şikestina xwe bi xwe re û çarenûsa xwe jî bi tena serê wê li ber bayê felekê, wisa mit û mat û pepûkî, nehêlim.



Dinivîsînîm da ku ji wan xelkên rêzdar ên ku dixwestin dîlok û lorîk û nehvirînên dayika min ji bîra min bibin û zimanê min jî jê bikin re bibêjim: “Bi kurdî dinivîsînîm da ku her kêlik ji we re biçesipînim ku ez hebûm û heme û dê hebim.”


Ş.S: Wek xwendevanekî we, di hin cihan de zimanê şîra we bi min giran tê. Li gorî we di şîrê de divê ziman çawa be? An jî bi kêmasî divê asta zimanê helbestê çawa be?

E. H: Alava bingeîn a derbirîna helbestvan ziman e. Da ku helbestvanek, kî be û çî be bila bibe, bikaribe şêwazên derbirîna xwe ya helbestî zeft bike û di çarçowe û naveroka wê derbirînê de, xwe jî wek bûnewerekî taybetmend, bi çêja xwe, bi rengê xwe, bi amaje û hêma û nîgaşên xwe biafirîne, pêwist e ku rola zimanê helbestê û rola xwe di hundirê wî zimanî de nas bike. Zimanê helbestê ne hêsan e, çimkî

zimanê kûrahiya mirov e. Zimanê hest û nest û giyan û wijdan û êşa mirov e. Bi kurtî, dema ku ziman bibe zimanê derûnan û birînan û çarenûsan, neçar e xwe ji asta xwe ya rojane û ji asta zimanê kerîyan û kolanan rizgar bike.

Peyv, gotin, wîşe, ziman bi gelemperiya xwe, berî helbestê heye, erka herî serekî ya helbestê jî ew e ku wî zimanê heyî û

naskirî ji asayiyê rût bike û bi xeyaleke cihêwaz avahiyên cihêwaz damezirîne. Ez bi kurdî dinivîsînîm, kurdiya ku pê dinivîsînîm bi qasî ku zimanê Kurdan e zimanê min e jî, lewra mafê min jî heye ku wekî xwe dan û stendîna pê re bikim. Bi kurtî, şêwazê dan û stendina min bi zimên re, Wekî serencam, awayên têgihîştin û têramandin û bîr û boçûnên min der barê min û der barê derdorê û hemû kêşe û



pirsgirêkan û di nav de jî zimanê nivîsandina helbestê, destnîşan dike.

Ş.S: Amûde... Welatê te yî bêdar û av... Lê di helbestên te de dar û daristan gelek caran derbas dibin. Ji bo çî?

E.H: Di helbestê de nêrîn û helwest û derbirîna der barê bajaran de tê guhertin, ango ne pêwist e ku bajarê min ê di



jiyana vê gerdûn û van bûneweran de, her dem û her gav bûyer hene, rûdan û diyarde hene. Hin ji wan xweş in û hin jî êşdar, şîniâmêz û wêranker in. Qedera me wisa bû ku beşê duyem ji vê hev kêşê pare me ya bêhempa be.

Me gelek bûyerên tal û xemgîn jî di jiyana xwe de dîtin û bihîstin û em bi xwe govan û şahidên gelean ji wan in.

helbestê de û bajarê min ê di rastî û realîteyê de heman bajar bin. Her wisa di helbestê de jî, di navbera du helbestvanan de der barê awayên danûstendina bi bajaran re nakokiyên mezin peyde dibin.

Yanê nêrînen Bodlêr (Beaudelaire) û yên Waytman (W.Wiltman) ne wekî hev in, ên Êlwar (Eluard) û Paz (O. Paz) jî ne wekî hev in. Her yekî ji wan di helbestên xwe de pirsgrêkên di navbera xwe û bajaran de bi şewazekî, bi hêmayekê, bi zimanekî û bi hestekî der biriye.

Amûda ez wê dibêjim jî, ne ku bi tenê bajarê min e, bi gelekî wêdetir de ye, bi min re ye, ne wek jiyanê lê bêhtir nêzî û di çêş û di çêja mirinê de ye.

Ş.S: Sînemeya Amûdê û şaîrekî ji Amûdê... Tu bikî nekî ev bûyer xwe di şûra te de jî dide xuya kirin. Tesîra bûyerekê li ser şûrê heta ku heye?

E.H: Di jiyana me de, di jiyana hemû mirovan de, di jiyana mirovatîyê de, di

Hin ji wan bûyerên kovandar takekesî û şexsî ne, hin ji wan jî gelemper û giştî ne. Ji bo min, şewata Sînemeya Amûdê, him takekesî û him jî giştî bû. Bajarek dişewite û birayê min di wê şewatê de, wek hevalên xwe, dilê bajêr û dilê diya min bi xwe re dibe.

Ji wê kêlîkê û vir ve, li Amûdê, bi tenê şînî peyde dibe, reşgirêdan peyde dibe, goristana mezin dibe, jiyan kelê û tamsar dibe,

Ş.S: Toza Amûdê di helbesta we de wek hêmayekê pir xweş rûdinê. Ev hêza şaîr e yan jî hêza şûrê ye?

E.H: Her helbestekê wêneyên xwe yên helbestî hene, her helbestvanekî/ê jî di wê çarçoweyê de xawen şewazekî derbirinê ye, ango wêneyê helbestî, ji alî hest û amaje û hêrsa derûnî ve, derbirinê dewlemendtir dike, ji alî hunerî ve jî wateyên rût û bêwate watedar dike û wan nêzî hestê mirov dike. Di helbestê de wisa ye, rola wêneya helbestî ew e ku derbasî kûrahiya tiştan bibe û rê bide me ku em wan tiştên nenaskirî bi awayekî din nas bikin.



Li vir, hêza heyî hêza bi çi awayî nivîsandina zimên e, hêza ku çawan ê helbestvan xwe dûrî wateyên naskirî yên peyvên bixîne û asoyên teze û wateyên nû li ber peyvê veke.

Bi kurtî, dema ez der barê toza Amûdê de tiştêkî bibêjim, wek helbestvan, çimkî ew toz di helbestê de tê gotin, pêwîst e ez wê tozê ji çemk û wateyên wê yên xwezayî û berdest rizgar bikim û hêza xwe hetanî radeya dawîn bi kar bînim, da ku wê tozê nêzî bûnewerî û zindîbûnê bikim.

Ş.S: Em hinekî vegerin ser wêje û helbesta welêt. Hûn bi giştî şîr û edebîyata kurdî di kîjan astê de dibînin û bi taybetî li bakur hûn rewşê çawa dibînin?

E.H: Bawer nakim ku mirov dikare, li derveyî peyivîna der barê rewşa ziman û çanda kurdî bi giştî, der barê helbesta kurdî de bipeyive.

Di sedsala dawîn de, hebûna me û bûnewerîya me ketine metirsî û velerzîneke mezin û hê jî rewş berdewam e.

Em neviyên têkçûnên pir mezin in. Her tişt ji me hate dizîn. Hişê me, hest û dilê me, raman û mêjiyê me bi sînoran û bi zimanên cihêreng ên serdestan hatin damezrandin. A niha em bêhtir bi lalî nêzî giyanên xwe dibin. Em li derveyî dîrokê hiştin û rê nedane me ku em jî li gorî hêz xwe beşdarî şaristaniya mirovatîyê bibin.

Lewra em a niha bêtir felsefe, bêtir pirtûkxane, bêtir raman û bêtir projeyêke şaristanî ya çalakdar beşdarî xwenasîn û nasname û dûwaroja xewna xwe dibin.

Helbesta kurdî jî yek ji qurbanên wê qonaxa zorbar û dijwar e. Ango neynika zimanekî qedexê, bîpêkirî, çewisandî û serencama perwerdehî û hînbûn û bişaftina di ziman û çand û kultura yê dîtir de ye.

Di destpêka sedsala 20î de, çend gavên pir hêja di warê paristina reh û rîş û çêj û taybetmendiyên derbirînê û gurrkirina hestdariya helbestî hatibûn avêtin, lê piştê êdî em rû bi rû li pêberî makîneyên asîmilasyonê radiwestin, da ku qonaxê nû dest pê bike, qonaxa windakirina hestan û ziwabûna xeyalan û qonaxa di hembêza çandên biyan de hînbûna derbirînê.

Bi kurtî, pir bi kurtî, helbesta kurdî ya ku bi zaravayê kurmançî, îro ro tê nivîsandin, li kîjan parçeyî be bila bibe, di çerxa zimanê dibistanê de tevdiqere, pir dubare dibe, helbestên helbestvanên her beşekî, gelekî, bi şewazên derbirîna xwe, di çêşnê hev de ne û wekî hev in.

Alav, derfet, hêza pêşîn û ya dawîn a ku dikare me gişan ji vê çarenûsê rizgar bike ew e, ku em xwe vekolin, li îstegehên windayî yên giyan û hiş û bîra xwe bigerin,

ji nû ve xwe di naveroka hestdariya zimanê xwe de perwerde bikin.


Li Bakur hin ezmûnên balkêş hene, hewldanên ji dil peyde dibin, bi tenê hewcedarî avdana hişê kurdewariyê ne, da ku raz û nepenî û sirên vî zimanî zeft bikin û xwe ji wek bûnwerên taybetmend derbibirin û biafirînin.

Ş.S: Hin kes dibêjin ku her kesê bi kurdî dixwîne a niha helbestê dinivîsîne jî, ger wisa be, gelo tevliheviyek di pirsê nivîsandin û asta helbestê de tune ye, tu çi dibêjî?

Gelek tevliheviyên din ên ji tevliheviya helbestê mezintir, malkambaxtir û tirsnahtir hene, gerek em guh bidin wan. Lê pirsê asta helbestê bêguman giring e.

Baweriya min wisa ye, bila her kes di vê qonaxa ku kuştina hestên û şuştina mêjiyan berdewam e, binivîsîne -xwezî her kesê binivîsanda- lê bila hemû aso li pêşberî pirsê rexneyê jî vekirî bimînin.

Ma kî dikare bibêje, ger rojekê ji rojan kurdan dest bi xwendina zimanê xwe kir û bi zimanê xwe perwerde bûn dê ev berhemên me bi kêrî wan û avakirina hest û mêjiyên wan werin?



E.H: Em çima aciz dibin? Xwezî a niha piştî vê asîmilasyona dijwar pênc milyon helbestvanên kurd hebûna! Çima tevlihevî ye? Bila her kes hewl bide helbestê binivîsîne, çimkî bi tenê di nivîsandina helbestê de em dikarin xwe ji nû ve di pîroziya hestkirina bi zimanê de xwe de bibînin. Di helbestê de çi rêbaz û zagon û yasayên taybetî nîn in, gelek caran tevliheviyên helbestê ji tevliheviyên din ên jiyana me xweşîk in û tekûztir in.

Ş.S: Piştî sal 1990î jenerasyonek li Bakur çêbû. Ez bawer im tu gelekê ji wan nas dikî. Tu şîra wan kesa çawa dibînî? Tahma kurdî çiqas ji wan tê?

E.H: Rast e. Lê wek min berî niha jî got, hewldanên balkêş, wêrekane û dilsoj dest pê dikin.

Şêwazên cihêreng û taybetmend, hêdî hêdî, di çarçoweya bidestxistina alavên derbirîna de berfireh dibin.

Ez ê dîsa vegerim pêwîstiya ku em giş, bi gavine jixwebawer, hest û mêjiyên xwe ji kultura serdestan rizgar bikin, erkên xwerizgarkirinê, ji kê neyê xwestin, di serî de û berî her kesî ji helbestvanê/a kurd tê xwestin. Çimkî pîrsa bingeîn a jiyanê ji bo helbestvanê/a kurd zimanê kurdî ye. Îro pasvanê herî dilsoj ê vî zimanî, yê hişê vî zimanî, yê berdewamiya vî zimanî, çarenûs, mayîn û nemana vî zimanî, helbestvanê kurd e.

Ş.S: Ên ku te ji nêzik ve nas dîkin dizanin ku te demeke dirêj dest ji şîrê berdabû. Lê gava tu cara yekem hatî festîvala rojên edebîyatê bi vegeerê pirtûkek te yî bi navê 'Bajarê Dirinde' hat çapkirin. Çi tesîr li ser te çêbû û te dîsa şîr nivîsand?

E.H: Keçeke ciwan ji keçên Amedê, ji nişkê ve li pêşberî min rawestiya. Kirasekî peyrûzî, porekî dirêj û çavine ku bi tenê dixwestin Helebçeyên kurdan bibêjin.

Ji min re got: mamoste! Dema min bihîst ku dest ji nivîsandina helbestê berdaye, wek adetên kurdan, min kirasê xwe çirand û keziya xwe kur kir.

Deftereke bi çavekî reş pêçayî û di nav defterê de keziyeke hûnayî ber bi destên min ve anî û got: fermo!

Min defter û reggirêdana dîrokî ya kurdan bi xwe re anîn Swêdê. Min xwest ku kezîkurkirina Gulîzerê wisa bêxwedî û bersîv nehêlim. Min xwest tiştekî ji Amedê re bibêjim, tiştekî hêjayî reggirêdana wê be, tiştekî hêjayî agirê hinavê wê be. Amed şewata herî rasteqîne ya welatê xewnan bû,

Amed ji bo hemû kesên ku a niha di paş çeperên bendeman û bêrîkirin û qonaxan de dinalin û bilind dibin, sirûda nemir a eşqa nemir e.

Ş.S: Te têkilî û danûstendinên di navbera nivîskar û şairan de çawa dîtin û li gorî te divê çawa be?

E.H: Sosret û malkambaxiya ku bi serê ziman û çanda me û kesayetiya me ya newteyî hatiye û hê jî berdewam in, ne tiştine veşartî ne, ne diyarde ne hêsan û sîvîk û asan e. Pêwîst e em wan şîrove û analîz û rave, raman û felsefeyekê ji bo dûwaroj û çareseriyê biafirînin.

Asîmilasyona ji hesin a ku li cem we, kêlîk bi kêlîk, pêk tê û berfirehtir dibe, pêdiviyî têkoşînê, westan û bi xwebawerî û hişyarî û zanînê ye, pêdiviyî hişmendiyeke rewşenbîrane ye, da ku bandora wê, wêran û kavilkirina wê piçekî kêmîtir bibe.

Barê Bakur ê wijdanî û berpirsiya wê cografayê ya sincî-exlaqî û dîrokî jî pir giran û dijwar e. Di dîroka hinekî dûr û gelekî nêzik a tevgera azadîxwaz a gelê Kurd de, rewşenbîrên bakur qurbanîyên pir mezin pêşkêşî naverok û wateya têkoşîna rastîn a peyvê û nasnameyê kirine. Gelek ji



wan şehîd ketine, gelekên din jî bi şewazên çepelane û bi reşekujî hatine kuştin, girtin û îşkence kirin û sergom kirin.

Min dixwest bibêjim ku erkên pir giran hecwedari rewşenbîrên pir giran in. Îro dema ku dîmen tê ber çavê min, dema ku peywendiyên û asta guftûgoyan bi bîr tînim, qet di gel erk û barê giran ên min di serî de gotibûn naguncin.

Ez nizanim ka têkilî gerek çawa bin, tiştên ku dizanim ev e, projeya rewşenbîrî, şaristanî, çandî ya ku pêwîst e çarçoweyên xwe yê teorî û felsefî ava bike û hewl bide ku ber bi ronîkirina pirsgerên hebûna me ve here, bihingive pirsên ziman û nasnameyê, pirsên dagirkerî û dîrokê, pirsên sînoran û taybetmendiyên û pirsên giyanê vê trajiya kûr û berfireh, ev proje jî hest, raman, hêz, çalakî, jî mêjî û pênuşa rewşenbîrê bakur tê xwestin.

Çendîn hûn li van kêşeyan xwedî derkevin, ew qasî jî hûn ber bi zeftkirina wateya rastîn a nivîsandin, nivîskarî û helbestê ve diçin.

Ş.S: Demeke dirêj e tu li Swêdê dijî, min dixwest pîrsa nivîskarên li derve jî te bikim, ka rewşa nivîsandina bi kurdî li wir çî ye?


E.H: Jiyana nivîskêr ger li derve be, yan li hundir be, an bêsedem ku em bibêjin ev nivîskarekî baş e, yan na. Bi gotineke din, cih û war û cografîya nivîskar nabe bahane jî bo behremendî û şarezaiya wî. Tiştên ku li derve heye azadiya nivîsandinê ye û nivîskarên ku li derve ne, li bin sîwaneya wê azadiyê, dikarin her tiştî bêtirs binivîsin, biweşînin û belav bikin.

Li derve jî wek hundir, gelek berhemên ku ne hêjayî xwendinê ne û li derveyî pîvanên afirandin û huner û wêjeyê ne û gelekên din ku dê şopa xwe di laş û giyanê kurmançiyê de bihêlin, hene.

Ş.S: Birêz Huseynî ez bi vê guftûgoyê pir kêfxweş bûm. Di dawiyê de tu yê jî xwendavanên Kovara W'yê re çî bibêjî?

E.H: Ji we hez dikim, çimkî hûn bi zimanê xwe dixwînin!





Pirsên Gîrokî

Ehmed Huseynî

Di cîhana nivîsandinê de, hin pirs hene da ku ragihin û velerzînê durist bikin, pêdiviyê mîrxasî û cegerdariya pênûsan in.

Vejandina pirsên tirsnak û aloz, wek erk, wek berpirsî, wek rola dîrokî, hem jî wek asta şaristanî û hişyarî û hişmendî, bi radeya rewşenbîrî ve û bi asta rewşenbîr ve girêdayî ne.

Pirsên me bi hiş, bîr, nasname, xewn û afirandinê dest pê dikin û li nik awayên

derbirîna zimanî û dabeşkirina giyanê kurd û hewldanên ziwakirina hest û nestan ranawestin.

Di vê çarçeweyê de, pêwist e ku pirsên me serçavka hemû pirsên derengmayî û gîrokirî, biçirîne.

Da em li bendî xelkê nemînin ku çewtiyên me bibêjin û li gorî berjewendiyên xwe şirove bikin cegerdariyeke rewşenbîrane gerek e.

Da em şopa xwe û rola xwe û çalakiyên giyanên xwe, wek serencam, di naveroka zimanê xwe de bi cih bikin, Gerek em bi xwe êdî bikaribin çewtiyên xwe bibêjin,



lawaziyên çand û dîrok û têkuşîna xwe destnîşan bikin, di şevistana dîrokê de li xwe bigerin, li giyanê xwe, li hiş û îstegehên ziwabûna xeyala xwe, li armancên hebûna xwe û dawî jî li raste-qîniya afirandina xwe bigerin.

Eger em bikaribin van çewtiyan û lawaziyên bi guftûgoyên hêja û bilind ronî bikin, em dê bikaribin gavên xwe hêdî hêdî ber bi ramanê şaristanî ve biavêjin, em ê bikaribin çarçeweyên teorî jî bo zimanê xwe, ji bo pirsgerêkên çand û wêjeya xwe ya neteweyî, ji bo rasteqînî û bejn û naveroka nasnameya xwe, ji bo helwesta xwe li hemberî xwe û li hemberî dorhêla xwe, damezirînin.

Îcar ji bo ku em xwe nexapînin gerek em bizanibin çi bi serê me hatiye, em û miriyên xwe li ku jî hev bi dûr ketine, em kî ne, ji ku hatine û di kîjan karxaneyan de hem giyanê me û hem jî laşên me hatine çêkirin? Bi kurtî, hetanî kîjan pileyê, wek rewşenbîr, em dikarin xwe ji desthilatiya miriyan rizgar bikin û şûn û cih û demên xwe berceste bikin?

Gerek em ji xwe bipirsin: gelo bi zimanekî, ku ji kulanê, ji dê û bavan û bi awayekî devîkî hatiye wergirtin, afirandinên rastîn çê dibin yan na?

Zarokê ku şeş salî ye û berê xwe dide dibistanên serdestan da ku bi awayekî rêzanî û rêxistinî û sistematîk hînî xwendin û nivîsandina zimanekî biyanî bibe, bêguman dê ew ziman di dawîya dawî de bibe zimanê hest û nestên wî, dê xeyala wî bi wî zimanî perwerde bibe, dê zanîn û hişyarî û asoyên têgihiştina hebûna wî bi wî zimanî dewlemend bibin û dê bi wî zimanî, ji ber ku zimanê hînbûnê ye, hêrs bibe, bilerize, bixeyide, bigirî û bikene.

Ji xwe li gorî serdestan her û her zimanê wan şîrîntirîn ziman e, mirovatî bi dîroka wan a neteweyî dest pê dike û bi dawî jî nayê. Qehremantirîn, comerdtirîn, zîrektirîn û baştirîn netewe neteweyên wan in, xweşiktirîn xweza û welat welatên wan in, wêje û çand û rewîştên herî hêja û balkêş diya yên wan in. Mezintirîn feylosof, helbestvan, zanyar, ramyar, serpereşt û dîroknas ên wan in.

Wisan em perwerde kirin, wisan dest bi zuhakirina giyanên me kirin û wisan bejna xewnê di şeş saliya me de qurmiçandin.

A niha êdî wext e ku em li xwe mikur werin û bibêjin em bi xwe şagirtên herî dilsoj û destpak ên wan çandên birêz(!) û bi rûmet(!)in. Lewra gerek em zimanê wergirtî û zimanê hînbûyî jî hev cihê bikin. Gerek em zimanê ramanê û zimanê hest jî hev cihê bikin. Gerek em nivîsandinê û afirandinê jî hev cihê bikin. Gerek jî em bizanibin ku a niha lêkulînen derûnî-psîkolojî yên zimên dibêjin ku rêzimana zimanekî di dema hînbûna sistematîk de bîr û bawerî û teoriya hişyarî epîstemolojî ya mirovan çê dike.

Nivîskarên vê qonaxê jî bi xwe, kêma zêde, ew zarokên şeş salî ne. Bi wateyeke din, wek min li jor gotibû, şagirtên herî dilsoj û destpak ên çanda serdestan in. Yanî, bi giyanên ziwa, bi xeyala birîndar, bi ferhenga lawaz, dê berhemên hêja, bandorên kûr û asoyên berfireh nayên çêkirin.

Li vir gerek em ziman, wek struktûr û bûnnewer, ji nivîskarên îro yên zimên cihê bikin. Mebesta min ew e ku bi heman zimanî Cizîrî û Feqê Teyran berhemên xwe yên nemir nivîsandine.

Ez dixwazim bibêjim, da ku zimanê me jî êdî dest bi teqîna xwe bike, xeyala me jî dest bi zeftkirina asoyên xwe bike, çêjwergirtina me jî dest bi vedîtina co û rûbarên xwe bike, gerek em piçekî din bîna xwe fireh bikin, ta



zarokên kurd bi zimanê xwe dest bi xwendinê bikin, bi zimanê xwe rabin û rûnin, bi zimanê xwe perwerde bibin û bi zimanê xwe mezin bibin.

Ji derveyî vê prosesê, bawer nakim ku şagirtên dibistanên serdestan dê bikaribin laş û giyanê kurmanciyê ji hundir ve ronî bikin.

Dîsa dixwazim bi kurtî bibêjim ku, eger kurmançî jî îro ro wek erebî û tirkî û farisî bûya dê 99% ji nivîskarên ku îro bi kurmançî dinivîsînin tunebana. Ji ber çî vê yekê dibêjim?

1- Hemû nivîskarên ku îro bi kurmançî dinivîsin, zimanê wan ê dibistanê xurtir e, berfirehtir e û kûrtir e, lê nikarin bi wî zimanî binivîsînin digel ku xwe dikujin da berhemên wan bêne wergerandin ji bo zimanên serdestan. Gelek caran jî yê nivîskar û yê wergêr bi hev re di heman dibistanê de û bi eynî zimanî xwendine.

2- Hemû nivîskarên ku îro bi kurmançî dinivîsin, zimanê wan ê serekî ji bo têgihiştina jiyanê, ji bo têgihiştina bûyer û

rûdanan, ji bo têgihiştina pirsên felsefîyane yên evînê, mirinê, nasnameyê, xweşî û şîniyê, zimanekî din e. Ango nivîskarê kurd bi zimanekî dijî û bi zimanekî din xwe derdibire, ma ji vê şîzofreniyê diwartir heye?

3- Nivîskarê ku 25 salan li welatekî ji welatên Ewropayê dijî, ku zimanê wî welatî dixwîne, bi wî zimanî dipeyive û di dezgehên çandî û kulturî de berpirsê dike, nikare bi wî zimanî binivîsîne, di wexta ku em dibînin

çawan nivîskarên rastîn ên ji miletên din piştî çand salan ji mayîna xwe dest davêjin zimanê nû û berhemên balkêş diafirînin, nimûne jî pir in ji Siuran û Brodiskî hetanî ku bigihêje Kundera. Li vir jî êdî bi awayekî pir zelal tê xuyakirin ku pîrsa nivîsandina bi kurmançî pîrsa keysperestî û lawaziya ziman û tunebûna behreyê ye.

Di dawî de dixwazim bibêjim ku tenê pênûsa dahêner û xulqêner dikare vê rewşa aloz derbibire, lê sed mixabin ku ew pênûs di kurmançiya îro de peyda nebûye.

Li bin sîwaneya van bîr û ji boçûnan em dest bi avakirina hişê zimanê xwe dikin, ango dest bi vekirina vê pencereyê dikin da em lixwegerîne ber bi rexên wê yên nediyar ve rakişînin û li hemberî zimanên şikestî û hejar li bîn û çêj û reng û dengvedan û pêjinên afirandin û dahênanê bigerin.

Di vê gernameyê de, sawa me sawek e zimanî ye. Henasa me henasek e rexnekariyane û cegerdar û wêrek e û gavên me jî ber bi dawêşandina toza dîrokê ve, bi hêminî, diçin.

Sebarete Bi Ehmedê Huseynî, Bi Duh û Îroya Xwe Ve Pêşekeke Li Ser Pêwendiya Şoreşê û Wêjeya Kurdî

Kawa Nemir


I

Pêxember Mihemed, di heyna damezirandina sazî û dezgehên xwe yên *dewletî* yên îslamî de, rojekê ji Hesên Bîn Sabîr re dibêje, “Li dijî mişrîqan zeman (hîciwan) binivîse, di vîrî de wê Cibraîl bi te re be.” Gava ku em wiha bi carekê ve bîr û bala xwe berdin ser kûranyên wan nimûneyên li ser vîrî mijara sext, ku hema em dikarin bibêjin bi hejmarên xwe qiyametê in û ji sazî û dezgehên dewletî yî pêşîn ên sumerîyan û vir ve ye di hemû qonaxên hilweşan, çolbûn û vedameziranê de bi heman awayan derdikevin mexderê, em dibînin ev babeta ku lêkdana di navbera layenên *gunehkar û gunehbar*⁽¹⁾ de tîne, hem gelekî nû ye, hem jî bi tîra xwe kevin e. Nû ye, ji ber ku, xasma ji bo qorziyên çandî û hunerî yên kurdan, ji bela ku hîç bi rastî û duristî nehatiye hêlengandin, nû ye; kevin e, ji ber ku feleka em kurd tê de, bîrî ku şoreşa zimanî (*linguistic*) bînin bîra xwe bi awayekî çawalêhato û bergirtî û sergirtî, bê rê û rêzan, qaşogiravî, helbestê dinivîsin, dizivire û bi vîrî babeta xwe re birek guftûgoyên nû li yên kevn zêde dike, kevin e.

Yekî dil û cegerdarî hebe ku rabe pirs û kêşeya şoreşê û wêjeyê hêlengîne (Di vir de, mebesta me ne şoreşê çekdarî ye, an jî

bizavek e, ku li jêr pêşengiya partiyekê hilweşandina dirûvên hişê kevn bike, di şûna wê de qonaxê nû bîne; mebesta me ji vîrî yekê, şoreşê wêjeyî ye, ku xwe bispêre zimanekî birêkûpêk, bi destê wêjeyê nûjen awayên nû yên ramanê pêk bîne!), rahiştin û hilgirtina vî barî û vî barûdoxê zehmet e. Bi ser de jî, ev kesê/a navborî, bi nasnava xwe kurdekî/e tepikwalgêr⁽²⁾ be, qiyametê zanyarî, tîbînî û hayjêhebûnê in di dest de. Gava ku George Orwell, di salên 1940î de, bi ser nasnava nivîskarî û rewşenbîriya îngilîzî de bi dînamîk û birhanên wê yên stylea jiyanê (hemû rewş û awayên ku li jêr tesîra xwarin û vexwarinê, wergirtina cil û bergan, hîlbijartinên xwendina pirtûkên kategoriyên cihê cihê, hemû awayên û ramanê pêk tên), bi pêwendiya takekesî bi hişê dîrokî re (bo nimûne, di sedsala 16emîn de şewitandin û tîkbirina hemû keştiyên spanyolan, şerên Boer û Flandersê di zikê hev de nimûneyên zanyariyên dîrokî ne, ku di binhişên îngilîzan de kêmkirina her





hewiyane), bi karsaziya dêwê heftserî ya ku di sedsala 19emîn de rê li ber geşedan û kawdaneke mezin vekir, bi qesirbendiya bajarên bakur û başûrê Îngilistanê yên di binê qîra reş a palûkeyan de mayî, bi derûnên cihêreng ên mirovên bakurî û başûrî vedibe, gelek zanyariyên kitekit, gelek xwendinên balkêş ji wan gotarên xwe re dike xerc û bingeh.⁽³⁾ Pirs û serêşîya Orwell ev e:

“To accept civilisation as it is practically means accepting decay.”⁽⁴⁾

Îro ro, bi gotina rasterast, serêşîya kurdan a afirandina wêjeyeke ku xwe bispêre şoreşa deqên gelekî konsantre, ji sedî sed tiştêkî wiha ye. Reng e ku were gotin, -dîsa ew guftûgoya kevin î pûç-, Orwell kurê nifşekî

ye, ku bi giranî ji komek nivîskar û helbestkarên rastgir î wekî Rudyard Kipling, William Ernest Henley, T. S. Eliot, Ezra Pound û ta dawiyê pêk tê û em pêşî li nimûneyên xwe binihêrin, lê belê dîsa jî em ê gotina xwe teksîr nekin û derba gotina xwe lê din: Kar û barê me hewldana têgihiştina fenomenan e, ne rexnekariyeke bêfîşek e, ne tîrbaziyeke korane ye, ne belengaziya nivîskarî û helbestkariyeke bêxwendin û pirnûsî û sergêjiya peyvan e û ne jî durûtiyek e, ku her kesek, bi şertê ku ew jî bi wî rengî were dilxweşkirin, bide binçengên yekî/e dîtir. Kar û barê me, bi riya kûrkirina gotinên rojane, bi riya ziravkirina destnîşankirinên qelew, rûtkirin û riswakirina bêbextiya takekesî ye, ku ev jî bivê nevê bi zêdebûna mil û destên xwe yên *heram* civakê *amorph* (bêteşe) dike, sexteriya

nivîskî vediguhere sexteriya gelemperî,
odeyên dîwarên wan zer ên partiyên siyasî,
tê de rû û sikûmên çilmisî, xiloxwarî,
terîşterîşî, pirtîpirtî zêde dibin, bazara
nezaniyê dibe mezintirîn û firehtirîn bazara
bajar û navçeyên Kurdistanê. Her wiha xuya
dibe bê çima kesên siyasî yên ku di qorzî,
meqam û taxên xwe de bûne sûretên serdest
dikarin wekî *rewşenbîr*, bi rayeya *rewşen-
bîriyê* li ser navê me nivîskar û helbestkarên
kurd gotaran bidêrin, di hindek
kampanyayên li ser navê parastina pîroztirîn
nirxên kurdî de îmzeyên xwe bi hêsanî
biavêjin. Sersebebê vê pêkanîna bermeqlûb
em in gelo? Bêguman em in. Duha me bi ser
piştê ketiye, ew tîpên bi navê *Ökkeş û
Allahverdi* yên faşîst (bajarên wekî Qers, Îdir,
Elezîz, Meraş û Erzirom ên ku şûrên xwe di
nava Kurdistanê Bakur de li ser serê kurdan
kil dikin) ji selçûqîyan bigirin heya niha gav
bi gav xwe dirêjî nava welêt kirine û dikin,
îro ro, îroya me ya ji zimanê xwe yê zikmakî
bêpar ji niha ve siberoja me ya tarî bi me
dide xwendin, aşkera dibêje, wê zarokên we
yên ku ji vê rastiya berbad bizeyin ji we bi
xwe re bixwînin meydan û ferman e! Lewma
bi hişekî kûr, bi bînahiyeke awirtûj, bi
xebateke rewşenbîriyane têgihiştina
fenomenên qonaxên ciyawaz li ser me ferz e
û pêwîst e em di mijarên ku me têvedidin
stûxwariyê de li hev bigirin, li hev
nebihurin.

Ev şêl û tevgera me ya dijwar, ev zimanê me
yê no û tûj î em di vir de bi kar tînin, dê
bihêle ku em li gel kêşeya *gunehkariyê û
gunehbariyê* tawanbarên xwe jî destnîşan
bikin, bi wî awayî herin ber dergehê Ehmedê
Huseynî.

*Dawe miriye! (5) Pêwîst e mirov vê daweya
mirî çawa fêhm bike? Gelo bi wateya xwe ya
doz bi qasî ku êdî nema bikaribe ji erdê rabe
piştîşkestî û mirî ye, an jî bi vê serîhildan û
raperîna pêşî çekdarî, paşê siyasî re em pê
bawer in nêzik e ji ziman, çand, wêje, huner
û behre û zerengîya kurdî re (mebesta me bo
niha kurmancî) derî û delîlek vebe? Ev gotina*



ku wekî gotineke rojane xuya dike, wê cara
yekem ku li Amedê ber guhê min ketibû, ez
bi ser de ponijbûm, min gelek wateyên
zêrîn lê bar kiribûn. Îro ro, li nava kurdên ku
meriv nikare qirşê xwe bide ser bendên wan,
hêjahiya gotinê winda ye. Gotin kelam e,
xwe navgêrî (arasteyî) girse û komên xelkê
dike, di nava zeman û meknan re gav bi
gav hêza xwe zêde dike, gel an jî cimeatê bi
hev ve kîp dike. Sêhra ku projeya netewe-
bûnê pêk tîne ev e, lê belê ji ber ku hê ji
destpêka projeyên wiha de kurdan projeyeke
wiha nebûye, ji ber egerên navxweyî û
dereke, ji ber ku wateya kûr a bi kurmanciya
spehî ya gotina *agirê te bitemire* ya kurdên
êzdî, ji xwe re delîve nedîtiye ku bijî û kur-

diyê demekê dest pê kiriye di astên jorîn ên civaka kurd de ji ber desttêwerdanên dereke hema hema tesîbkêşîya pîrozgotinên erebî, farisî û tirkî kiriye, karîgeriya gotinê, gotina ku *di pêşîya pêşîn de hebû*, di derûna kurdan de bi kêrî pênc qurîşan nehatiye. Lewma jî, qelsiyê û pê re jî sextekariyê û kurdbûnê çil pere ji hev şaş nekirine. Heke yek niha li ber vê gotina ku ji nebûna gotina xurt a li ser kurdan derketiye rabe, em ê bibêjin, Ehmedê Xanî yê ku tekane û yekem kesayetî bû projeyeke wiha bi riya Mem û Zînê anî, îro ro, be daxayew, bi me re ye:

Yarî û birayî û muwaxat
Nabit bi riyayî-yû meqalat

Yarî ne hêsanî ye, cefa ye
Meqsûd-i ji yariyê wefa ye
Axir tu eger nekî wefayê
Ewwel mede ber xwe cefayê

Ango, îro di van şert û mercên vê sedsalê de, ku êdî zimanzanî û disîplînên wê yên jêrîn mîna qalikên pîvazê ji hev vedibin, xwendina jêra deqekê ji xwendevanekî/ê bîrtûjiyeke gewre, bînahiyeke berfireh û gelek xwendinên ku bikaribin di peydekirina navikên deqan de alîkariyê bikin divê, em nikarin vê jêwergirana ji *Mem û Zînê* wekî çend replikên melodramekê, an jî *soap operayekê*⁽⁶⁾, an jî çîrokeke evînî bixwînin û fêhm bikin. Ne wisa ye! Em ji bîr mekin ku Ehmedê Xanî bi qasî ku bi wan peyv û gotinên xwe yên belengaz bikaribe strûktûreke xwedîproje ava bike û bi vê yekê re ji beşdarî hemû qonaxên dîrokê bibe ji me jêhatîtir û zîrektir bû! Ev giş parçeyên projeyeke hezkirinê, bihevdanhezkirinê, pevgihandinê, xurtkirinê û avakirinê ne. Gotin di zahirîya xwe de perde û xêlî ye, deq bi giştî di batîniya xwe de îdeolojîk e, romansek e, lê belê rêxistîneke xweşkar e, hîlbijartînek e, ku ji hebûna *Heşt Zeylên Bihuşte* ya Îdrîsê Bedlîsî rû ba dide, berê kurdan dide desthilatdariya kurdan,

arîstokrasiya kurdan a ku li ser pevgihana binemalên mezin î kurd bê damezirandin. Heke wiha nebûya, me yê bi hêsanî bikaribûya bigota, *The Tempest* (Bahoz) a Shakespeare esas bi tenê xewnek e, sêwirandinek e, ne pêşniyareke nû ya jiyanî ye, an jî *Welatê Bejî* ya Eliot ji bêzariya wî ya ji şerê malkambax pê ve ne tiştek e.

Îro ro, bi wateya xwe ya pêşîn a ku bibêje, *doz bi qasî ku êdî nema bikaribe ji erdê rabe piştîsikestî û mirî ye em nikarin bibêjin dawê miriyê*. Lê belê ji ber ku pêwendiyên xwe yên gelekî xurt bi sazî û dezgehên siyasî û hişê leşkerî re heye, em ê bi xala duduyan jî rayî nebin! Doz û dawê ne çareserkirina pîrsa kurdbûnê ye, pêşî ew e ku em tê bigihîjin bê ka çî ye, tiştekî çawa ye, di ku dera dîrokê de bi qinareyeke pola ve hatiye dardakirin, vê hebûnê çima rengê xwe, dengê xwe, ahenga xwe, çêj û ekla xwe winda kiriye. Em ê hê paşê bi ser kêşeya çareseriya rizgariya fizîkî vebin. Raperînên fizîkî yên ku xwe naspêrin gulvedan û geşedana hiş, rê li ber kûrbûna afirandina bi zimanê kurdî girtine, îro em hatine bi destê van pêkanînan di şîzofreniyeke xedar re derketine. Sedem rasterast girêdayî van xalên li jêrê ne, ku em çendî dirêjî pê bidin jî, kêmdimînin:

1- (Ku em bi çêja Adorno bibêjin)
Windakirina hesta hişyariyê ye, ku bi destên ne rayedar, lê raye(bar)ên kurdan pêk tê.

2- Sûdwernegirtina ji mîrateya xwe û ji ya gerdûnî ye, ku rasterê riya me dibe ser pîrsa kelepurê û zerengiya takekesî.

3- Peydenekirin û hewlnedana ji bo peydekirina perspektîfeke dîrokî ya rast û durîst e, ku bikaribe dîroka kurdan û Kurdistanê binivîse, vî karê bi têra xwe girîng ji perspektîfên zimanên serdestan re nehêle.

4- Tênegihîştin, rûtnekirin, şermezar û mehkûmnekirina rastiya ku barbaran (hêzên

dereke yên di welatên xwe de ji hev re cîranên dilpak in, rê û kolanên wan fireh in, villa û apartmanên ku tê de dimînin giş bi destên me têne avakirin û navê vê yekê di hişê me aliyê bindest de dibe şerê qezenckirina nanê rojane û risqê zarokan...) kirine libateke laş û gewdeyên me yên qewîn.

5- Bi tu awayî xwe rizgarnekirina ji dibistanên wan ên ku hê em virnî ne bi derba xedar î pêşîn me bi erdê ve cûm dikin.

6- Kêşeya nivîskar, helbestkar û hunermendên kurd, ku di rastiya xwe de –çi qas bi kurmancî, an jî bi dimilî binivîsin jî– pêşî di asta jiyana rojane de bi nezaniya xwe ji hev re nepak in, paşê di asta hesta dagirbûnê de ji dêvla ku bibin şagirt û feqiyên dilsoz ên hosteyên gerdûnî, hewl didin ku xwe bi nivîskarên dera han ên serdestên xwe bidin hezkirin.

7- Peydenekirina delîveyên xebatên hevbeş ên ji bo demeke dirêj bidomin. Bo nimûne, kurd nikarin bi hev re ji bo demeke dirêj kovareke ku bibe heyameke xwedî mîrate, pirtûkxane, dorhêleke rewşenbîr, kulîneke berhemdar bi rêk bixin, çap û belav bikin. Di meseleyeke herî biçûk de, çîrok heman çîrok e: Mange mir, dew bir.

8- Tênegihîştina parametreyên sedsalên ku bi dînamîkên xwe yên civakî, aborî, kelepûrî, siyasî, leşkerî û çandî ve rê li ber, bo nimûne, derketina romanê, qonaxa devkî (çanda pêşîne) û ya nivîskî (çanda duduyane)⁽⁷⁾, di wêjeyê de pirs

îrlandîbûnê⁽⁸⁾, cezayîrîbûnê, di nava civakên roavayî de rewşa ku helbest ketiyê, ku gelekî kêmtê xwendin, sedemên ku dihêlin deqên pexşanî û fiksiyonên zanistî gelekî werin xwendin û hwd. vekirine. Birek helbestkarên me yên xort bi avzêmen şêlî yên romantîzmeke şîzofrenîk de çikiyane, hejmara helbestkarên mezin î gerdûnî, yên ku ew bi riste û wateyên wan re çavnas

bûbin li ser tiliyên destekî nayên jimartin. 9- Di kêşeya kêmxwendina civakeke ji ber egerên ku bi ya me heya niha êdî gelekî hatine şirovekirin û hêlengandin de li paş maye, bûye *diwaykeftû û namoyî*, ew durûtiya me ya ku rê nade em bibêjin, beriya bi milyon gundiyên me yên ku rûpelek nivîsa kurdî ji wan re tiştekî mîtolojîk e, beriya komên xelkê kurd ên ku ji berhemhênanê hatine qutkirin, di bajarên xerîb hilnayên, nikarin di çandên serdestan de bihewin, pêwîst e nivîskar, helbestkar û *rewşenbîrên* (siyasîyên) me bixwînin. Xwendina ku em behs dikin, bêguman, ne xwendina berhemên oto-asimilasyonê ne, ne xwendina helbestên Ahmet Arif e! *Odeya xebatê*⁽⁹⁾ ye em behs dikin!

10- Nekirina arkeolojiya peyva kurmancî, tenegehiştina serboriya biwêj û gotinên pêşyan, bi her awayî bi rik bikaranîna dakokîkirina (tesdîqkirina) jehra rêzimanên zimanên serdestan, ku mîna marên teyar xwe şelandine nava rehên kurmancî, bi tirs û bertêka ku gel tenegehiştê avakirina hevokên kurt î lawaz, ku hê di sêrî de rê li ber avabûna zimanê zanistê, felsefeyê û warên ciyawaz ê berz (*elevated*) digirin. (Bo nimûne, romanên pêşîn ên Mehmed Uzun) Tewer nezanîna rêzimanê kurdî, zaravayên din, bi awayekî xurde bikaranîna rastnivîsa kurdî, ew bêhurmetiya ku her car bi destê nivîskarê zimanê kurdî li zimanê kurdî têye kirin (Dîsa, romana Mehmed Uzun a bi navê Tu,⁽¹⁰⁾ ku cara pêşîn e li Kurdistanê Bakur hate çapkirin! Di vir de, ez bêgav im bibêjim, ku ez bûm lalome!) û hwd.

Bêşik û guman ev destnîşanên jorîn *Deh Fermanên Pêxember Mûsa* nîn in. Lê belê çend nîşaneyên wê awatê ne, ku Gerard de Nerval di *Sedsala Şanzdehemîna* xwe de gotiye: “*Huner li her derê bi heman awayî ye, tu carî ne berhema xewnên şêrîn e, ne berhema hesta rastkîno ya dîndariyê ye, ne jî ya hesta ku xweza bi bayê bezê bestê lê radike; huner sar e, bi birêûzêya hesabkirinê,*

bi bikêranînê tê çêkirin. Zaroka rastiyê û bedewiyê ye. Giloka wan raman û gotinan e, ku di yek awayî de hatibin berhevkin.

Mebesta me ew e, ku em rezê ne tu rez bû, terezê jî lê xistiye rizgar bikin û em pak dizanin, ev kar cila şil e ketiye stûyê me zarokên vî nîfşê jî ferhenga hehecikan derketî.

II

"These wonders strange he sees, and many more,

Whose head is pregnant with poetic lore."(11)

bûneweriya mirov a ku ew lê digere û divê lê bigere, ji raza ku dora wî digire, ji tariya helbestê bi xwe dizê."

Em ê bînin bîra xwe ku Ehmedê Huseyniyê wekî gewdeyê kurmançiya wînda bi ser kaxiza spî de xûz dibe, nebûna xwe ya dîrokî di takekesiya xwe de dicivîne, dîroka peyva kurmançiya birîndar î di destên sextekaran de mayî ji xwendevanên bîrtûj û jîr re dike berdest û berhest, bi lêkirina şevên sedsalên koçberiyê diwana xwe dike ezmûneya me ya hevbeş, rabûye ranebûye bi vê tawana ku ew bi xwe guh nadê hatiye



To My Brother George, John Keats

Piştî ku me çend têbîniyên ku dîsa jî nikarin bêqidoşî û bêyomiya li ser serê zimanê kurdî (mebest jî vê yekê kurmançî ye), bi vî awayî jî li ser serê Helbesta Kurdî rût û tazî bikin, tune bikin, hilda binê qeftê, em hinekî din nêzîkî Ehmedê Huseynî bûn. Em ê careke din çend gotinên Gerard de Nerval ji xwe re bikin rêber, dirêjî bidin gotûbêja xwe ya navxweyî: *"Erka helbestkarî/ê ronîkirin e. Dijwariya zimanê wî ne ji xwezaya wî, ji*

tawanbarkirin. Ew çî qasî guh nede vê tawanbariya sextekaran jî, em guh didinê û ji xwe re dikin birhana serkeftina zimanekî ku birînen wî kew digirin, êdî hêdî hêdî radibe ser piyan.

Bêguman derdeseriya ku em jê re dibêjin Dîrok di asta nivîsandinê de proseseke xeyalî ye, hêmayî ye; ji kêliya pêşîn î dîroknûsê fermî dest diavêje pênûsa xwe û prosesa afirandina ku êdî dest pê dike tiştêkî li derî qewimînê çêdike, pêk tîne û pê de, hêwirzeyên ku li ser serên nîfşên bav û kalan geriyane diherikin ser sermîyanê

prosesa nû ya desthilatdariyê, da ku sazûman û hemû dezgeh bikaribin li ser hîmên sextekariyê û zordariyê bijîn. (Doza Franz Kafka bînin bîra xwe!) Ev prosesa dîrokî, a desthilatdaran e. Lê belê aya ev proses di hişê gelên bindest de çawa pêk tê û diqewime? Bersiva herî hêsan ew e mirov bibêje, ji eniya bindestan de berxwedanek dest pê dike li hemberî vê xeleta dojahî. Em ê jî bibêjin, di destpêka *Şoreşa Pîroz* de perspektîfeke wiha ya ramanî her car heye, bes mixabin ev yek çu carî di dîrokê de nebûye şîûr, nebûye serencam. Ku wisa bibûya, pêwîst bû trêna reş î navdar î Lênîn pê derbasî xaka Êrîs bû, paşê şoreşa mezin bi ser xist, bikaribûya di salên 90î de di kominîzma bêdewlet re derketa, bi milyon sirgûnên xwe yên li Sibîryaya dojeha spî ve li rawestgeheke şaş ji şiveriyê derneketa, walnegeriya. Wa ye mîna vê prosesa ku dîsa wiha pêk hatiye û min diêşîne, pirs û kêşeya man û nemana zimanê kurdî jî hatiye li ciyekî bi vî rengî asê bûye û aliyekî çareserîya vê pirs û kêşeyê jî, helbestvanê me yê xemgîn ê ku dikare ji hundir ve van çend dîmenên xemgîn bibîne, Ehmedê Huseynî ye.

Di sedsala rasthatin û rûberiyêke wiha de, beriya nan û ava me, beriya nivîn û banê me, tiştê ku pêdiviya me pê heye, raman e; ramana ku bikaribe xûzî ser pîrsa zimanê me yê ku esas em dikarin bibêjin şewitiye, lê îro doza sîmirbûnê dike. Lewma bi ya min ne hêsan e ez bi riya nîşandana hin helbestên wî bidim binçenga Huseynî, da ku ew jî di pişika xwe de biwerime. Mesele ne ew e. Ehmedê Huseynî qala vê prosesa pêkhatina dîroka me ya ku me bi xwe hîç nenivîsandîye dike, qala hişê dîrokî dike, qala paşxaneyê zimên dike, beriya ku li dora nêzîktêdayîna estetîk a helbesta ku îro em hewl didin binivîsin here were; beriya ku rengdêrên sexte yên wekî xweş e, geş e mîna polikên qelp bi pêsîra helbestvanan ve bike, qala çîroka çîroka me dike:

“Di hişê helbesta kurdî de, di qonaxeke pir tirsnaq û xeter û dilêşane de; qonaxa xwecûtin û xwedubarekirinê peyda dibe. Ev qonaxa skolastîk di laşê helbesta kurdî de zelal e, ango helbesta me digihîje pileyekê ku êdî nîfşê piştî Cizîrî û Feqiyê Teyran nikare tişteki lê zêde û helbestê dolmendtir bike. Ji lew re helbestvanên kurd ji bo berdewamiya jiyana giyanî mîrat û bermaya ku li berdest e bi kar tînin Qonaxeke pir dijwar, pir bêdeng xwe bi dubarekirinê berdewam dike.”(12)

Va ye bi van destnîşanên xwe ve Ehmedê Huseynî, li jêr pirîskên çend gotinên me yên kêrêm ên ji destpêka nivîsê heya niha, dibe fanoseke serdemî ji me re. Kak Huseynî bi awayekî gelekî berfireh sedem û tawanbarên me yên ku kirine zimanê kurdî di vê sedsala me ya dereng de bikeve vê rewşa dijwar, nîfş ji naskirina hemû gulan, ji hêz û şiyana gilîkirin û şirovekirina kulan bêpar bimînîn bi bêhna fireh nîşan dide. Kî ne ev sedem? Di seriyê serî de, ev dîroka rêxistinên siyasî û leşkerî yên kurdan e ev sedem, ku ji destpêka 70yî û pê de ji aliyê Serok Evdila Ocalan û Partiya Karkerên Kurdistanê ve gav bi gav hatin absorbekirin (hilmêtin). Têvî ku Ocalan, bi ya min, balkêştirin kesê kurd e, ku mirov nikare kiryarên wî yên sî salan bi dîktatoriyê, ezperestiyê, şîzofreniyê şirove bike; rewşenbîrên ku ramanên xwe yên li ser zeftkirina desthilatdariya xwe durist kirine (ev ên ku heya niha me nedîtiye rêzik û hevokerê bi zimanê xwe yî zikmakî nivîsandibin, lê belê gelekî bi hêsanî rengdêra rewşenbîriya kurd ji destên Taha Akyol û Hasan Cemalê dijmin werdigirin) şaş in. Çi dibe bila bibe, Ocalan û di şexsê bizava Partiya Karkerên Kurdistanê de, tevgera kurd rahişte çekên karîger, çalakîyên gewre kir, li jorê û li jêrê, li hundir û li derve çandeke berxwedanê afirand. Bêguman di vê yekê de rola şexsê Ocalan bi xwe gelekî diyarker e, aşkera ye. Ocalan hevoksaziyeke balkêş, zimanekî normatîf (fermandêr), ku dikare rast lê xe çep vegerîne, deqeke devkî ya ji kelamên miqedes hatî wergirtin (qonaxên mîtolojîk ên Mezopotamyayê, Quran, Încîl, Tewrat), di

axaftinên xwe de konsantrasyoneke berdewam bi kar tîne û ev taybetî giş, di asta dîrokî de, li dijî rebeniya kurdewarî ne, karîger in. Lê belê, Ocalan û tevgera kurd bi rêveçûn, kiryar û biryarên xwe yên li dijî xeta parastina zimanekî wekî zimanê kurdî, refleksa tunekirina zimanê me yê zikmakî bi cî kirin di nava kurdan de, bi bikaranîna zimanê serdestên me di hemû warên xebatê yên siyasî, leşkerî û çandî de.

Îro ro, xala têkoşînê ya ku bi giranî li ser me çend helbestkarên kurd maye ev e. Ev gotin jî, a rêzdar Ocalan e: *“Ji bo xwe nabe leşker, lê her yek ji bo dijmin dibe paşa.”*⁽¹³⁾ Bi wateya xwe ya şirovekirina binketina me ya dîrokî pir rast û şikûdar e, lê gelekî manîdar e jî! Piştî van hemûyan, îro em helbestkarên kurd, ya ku beriya me nehatiye kirin dikin (hewl-dana nûjenkirina pêşî zimanê kurdî, paşê helbesta ku bûye lîtava evînî û siyasî), ya ku beriya me nehatiye berhevkerin berhev dikin (kelepûr û zerengiya takekesî). Siûda T. S. Eliot hebû, ku beriya wî, di sedsala 16emîn de, John Donneê helbestkar-keşe bi helbestê rabûbû (nimûneya ku li nêzîkî Nîşaniyê me ye), Shakespeare hebû, Samuel Taylor Coleridge hebû, da ku bikaribûya bigihîşt a qonaxa xwe ya bilind. Wî reh û kokên xwe di wan deran de dît, wekî Pound xwe di nava şaristaniyan de winda nekir. Siûda William Butler Yeats şixulî, ku William Blakeê romantîkê reştarî hebû, lê belê beriya hemûyan Îrlanda birîndar, mîtolojiya keltan û şîzofreniya îrlandiyan hebû, ku bextewar im em jî dikarin nimûneyekê di wir de peyda bikin.

Ehmedê Huseyniyê kurê Amûda binxetê bi destnîşanên xwe û bi dîwana xwe li ciyekî wiha sekiniye, di bêdengiyê de dixulxule. Û em ê wekî Pound bibêjin, paşê...

III

‘Dîwan’a Ehmed Huseynî⁽¹⁴⁾

“Before we can have revolutions, there must first be revelations!”⁽¹⁵⁾

William Blake, sedsala 19emîn

St. John Perse di helbesta xwe ya bi navê Bo Danteyê de dibêje: *“Helbest, katjimêra lûtkeyan, riya dilsozî û mişextiyê, haveynê neteweyên xurt û hilhatina stêrkan li ser serê nefsbîçûkan; helbest, bilindiya rastîn, hêza nepenî ya di navbera mirovan de û di nava hemû hêzan de, heye ku yek ji wan hêzan e jî, ku dilê mirovê bi mirovên din re rû bi rû çî carî genî nake...”*

Bêguman ji bîr nakim! Em nifşekî kurman-ciya me ya ji “ferhenga hehecikan” derketî ne, em nifşek in, ku me dil heye derbirîna zimanekî dîlan û semaya lal û tat û kakas a bav û kalên me yên devxêlî diyar bikin, em nifşekî welatê bergirtî û sergirtî ne. Ji bîr nakim! Riya ku diçe qonaxa dawîn a ‘Dîwan’a Ehmed Huseynî dîr û nûr e, lê ne ku devling li me teng e, wehiyên ku wî heta niha kelimandine (Ji nifşê me yê kurmanciya Bakur re kifşkirin û diyarkirinên wî, em bibêjin!) di vê nivîsê hîlnayên.

Lê belê ez ê xwe bavêjim bextê şêxên me yên din, ku ez ê navên wan hildim û bibêjim: *“Dîwan’, katjimêra lûtkeyên me, riya dilsozî û mişextiyê, haveynê neteweya me ya jar û hilhatina cegerxwînan li ser serê dilbîçûkan; ‘Dîwan’, derbirîna rastîn, hêza nepenî ya di nava me de û di nava hemû derbirînan de, bêguman yek ji wan hêzan e jî, ku dilê me ‘namoyî’yan çu carî genî nake...”*

Di vê toz û tirabêlka kambax a helbesta kurmancî de, belê, ‘Dîwan’a Ehmed Huseynî; belgenameya, tembînameya temenê wî ya deq û şerê wî yê giran ê bi derbirîna kurdî re ye, ku bajarên me yên radestî çolbûnê bûne avreşin dike, gurên ku li “keriyên” me bûne perwar dikuje, bi şûrê şora kurmancî tirsê li xwedayên ku nahêlin kurd di riya azadiyê de sawa xwe biçinin difirîne. Her çend rabirdûya me ya nêzîk, hêwirzeya wê ya keregêjî hê jî rê nade ku em bikaribin kelepûra xwe ya vê sedsala ku belavbûna me kurdan dinimîne bi rastgotî û bi duristî sistematîze bikin, lê wilo xuya ye Ehmed Huseynî, di kurmancî de, yekane kes e ku

sêhr û efsûna Cegerxwînê mezin car din li kurdan girê dide. Lê tiştekî din ê bêhevta di qonaxên ‘Dîwan’a wî de heye: ‘Dîwan’a Huseynî dîwanek e dirame, bêqamkî fireh dibe, guhdar, bîner û xwînerê xwe digihîne peravên kurdewarî û hevçaxiyê, dev li kelepûra berteng a zimanî û derbirînî tehl dike, çêjên nemir ji çavkaniyên kelepûrên klasîkên Rojhilat û kurdî, ji movikên dengbêjiya kurdî, ji qewl û beyt û başkuriyên kevnar û ji avên zelal ên helbesta cîhanê digire. Zên û zerengiya pênuşa Huseynî van taybetiyan gişan bi bêhna fireh, bi rasteqîniya stratejiya poetîk li giyanê kurdî dike. ‘Dîwan’a Ehmed Huseynî devê derbirîna kurmancî vedike, toza peyva kurmancî di hevoksaziya asofireh û berfireh de dadiweşîne, “kirêtiyên” li ser bejn û bala peyva kurmancî bi şîrêzeya bistiyên me dişo.

Ehmed Huseynî vê yeka han, li Stokholmê, di nava nivîskarên “ji nişka ve” de dike. Gotina John Keats, ku di helbesta xwe ya bi navê *Xew û Helbestê* de dibêje, ji bo riya ku Huseynî daye ser destnîşankirineke rast e: “..... Kar hêsan bû: Hezar destkaran rûpûşa helbestê da Ser çavên xwe. Qewmê bextreş î bêxweda!”

Ehmed Huseynî, ya ku tê dilan, lê nayê milan, dike. Bi bextreşî û bendewariya xwe ve, bextspî û bextewar e. Tu nemaye gulên hemû qonaxên dîwanên me yên ku di hucreyên medreseyan de, di qul û qewarên qesr û qonaxên me yên xewn û xeyalan de bêxwedî mane, ne “ji nişka ve”, bi dayîna temenê xwe yê mişt xezalên reviyayî, bi xwîna xwe av dide, pêşkêşî gilî û gazine Cizîrî dike, pêşkêşî qedirzanên gulan dike. Ew bilbil e, li ser şaxên zêrîn ên gurdaristanên biyanî dike qal û dax e.

“Odîsyos” rêwîtiya giyanî ye. Movika dastanê ev e: Gelo dê Odîsyos çawa bikaribe vegere ser erd û milkê xwe, welatê xwe Îthakeyê? Xwezgîniyên har û barbar hatine di hewşa koşka wî ya ezîm de hêwirîne, dixwazin jina Odîsyos, Penelopeê ji xwe re

bikin jin, bi ser erd û samana Odîsyos de rûnên. Ev pirs, yek ji wan pirsên herî kevin e mirovahiyê bi riya lehengên xwe ji xwe pirsîye: Welat, mirin, nemirî, evîn, bêbextî, veger. Vegera li axa bav û kalan, vegera li ber pêşa Dayê, tizbiya Bavo. Helbesta nemiriyê ya Gilgamêş jî, serê hezaran sal e van pirsan ji xwe û ji me dike.

‘Dîwan’a Ehmed Huseynî, ku rasteqîniya xwe ji derbederî û mişextiya kurdekî gewre distîne, van pirsan ji xwe û ji me dike. Ku hûn xêliya li ser van risteyên jêrîn ên Ehmed Huseynî rakin, sosyolojiya di binê qatên van risteyan de hatiye hilanîn binirxînin, hûn ê rêwîtiya giyanî ya Ehmed Huseynî û “Odîsyos”bûna wî bibînin: “*Li vir, dimirim!*

Li vir, wek ko cara pêşîn

dê mirin ji dayik bibe, dimirim.

Li vir, dilê xwe pêşkêşî mijê û kulên xwe radestî bûkên xemsar

ên deryayê dikim.

Her li vir, di darbesta dilê xwe de pendên

“Odîsyos”ê sergerdan

werdigirim

û li ser eniya “Trawda”yê dîlana agirperestan li dar dixim

û berî ko bibim keleka demê, dimirim.”

Bêguman divê ji bîr nekim! Em nifşek in, ku li vir, li Bakur, li bajarên goristanên teng, me dil hebû em bidin dû bilindgoyên ji asoyên derbirîna kurdî “deng”an bibêjin. Ew daxwaz û arezûya ku Walt Whitman jê re gotiye kurtepiştên mirina esmanî. Ew hêz û şiyana ku Feqiyê balindego bi xwendina xwe ya kevnar pê av û çavkanî dane sekinandin, pê dest daye Xanî, ku wî jî li ser serê gerdûnê kiriye hey û hey. Em nifşek in yekî ku “*egoya civakî*”, ya ku Christopher Caudwell destnîşan kiriye, destnîşan bike ji me re pêwîst bû. Ji me re yek pêwîst bû mirina nivîskariya bêkelepûr, veşartina derbirîna jar û sergêj û belengaz di tîrbên kûr de bide xuyakirin. ‘Dîwan’a Ehmed Huseynî ya ku ji helbesta temenê wî pêk tê, bilindiya rastîn û hêza nepenî ye di nava me de, ku me li vir

bi salan e, hê 'Dîwan'a wî nehatibû Bakur, bi riya fotokopiyan li helbesta nûhatî ya kurmancî zêde dîkir. Bawer im ev gotinên min ên dawîn piçekî ji bo fikara Huseynî ya ku ji ber bextreşîya dîroka me ya dûr û nêzîk dertê bûn bersiv. Huseynî piştî dayîna temenê xwe, pirseke wiha dike, ku divê her kesekî rahiştibe pê nûsa jan û kulnameya kurdî hê di sêrî de ji xwe bipirse: "*Gelo rola zimanê min ê helbestî di warê afirandina peyva kurdî de heye yan na?*" Bi ya min, bi vê serencama ku Huseynî bi xwe bi lêv kiriye, ciyê baweriyê ye ku rola zimanê wî yê helbestî di warê afirandina peyva kurdî de roleke bêhevta ye. Ev hevoka wî ya ku mirov dikare pê sond bixwe, dê serê me xortan çu carî betal neke: "*.... li asoyê, ez berbanga jiyane û tavsorka mirinê têkel dibînim.*"

T.S.Eliot di helbesta xwe ya bi navê Têbîniyek Li Ser Helbesta Şerê de gotiye: "*Ne derbirîna hesta hevpar Ku di rojnameyan de xewşkî tê diyarkirin Xala ku li ser wê bi tenê teqîna Takekesî dişikê Di riya kiryareke bes nimûneyî de Da ku ya gerdûnî biafirîne, sîmbolekê ji bandorê Peyda bike li kû ye? Ev dîdariyek e, Ku tê de em*

Bi riya ezmûnê tevî hêzên derkontrolî dibin- Hêzên Giyan û Siruştê. Bi piranî ezmûna Takekesî gelekî mezin an jî biçûk e. Hestên me Bi tenê 'bûyer' in

Di xîretkêşîya bi hev re girtina roj û şevê de. Yekcar pêkan xuya dike ku helbestek bê serê Mirovekî gelekî xort: lê belê helbestek ne helbest e- Jiyaneke e."

Bi van şax û şov û nîşaneyên ku di vê nivîsê hilnehatin, bêşik û bêguman im bibêjim, 'Dîwan'a Ehmed Huseynî nimûne ye ku, digel pîrsa man û nemana zimanê kurdî, helbesta kurdî çawa dikare rabe ser zîn.

Sermawez 2002 – Tîrmeh 2005

Têbînî:

1- *Gunezkar pêwîst e wekî rastgir, neteweperest, diwaykeftû (bi soranî), namoyî (bi soranî), axa, serok û welatparêzên ji geşedanê bêpar werin fêmkirin. Gunezbar jî, wekî kes, kom û civatên helbestkar, nivîskar û hunermendên xwedî pîrêze, ew kesên ku piştîkurîtiya avakarên wêjeya nûjen, Baudelaire, Nerval, Rimbaud, Yeats, Eliot û yên din, werin fêmkirin. Bi ya min, di pîrêzeyên xwe de, her du paşgiran awayên xwe yên xebatê, opus moderandiyên xwe yên ciyawaz hene.*

2- *Tepikwalgerandin: (Bîwêj, herêma Serhedê) Wateya wê: Tevî ku kes an jî kesên din bi rastiya meseleyekê, an jî awayê rast ê çêkirin û pêkanîna tiştekî pê dizanin, gava ku yek bixwaze hê jî wan bixapîne, tê bikaranîn. Hevoka nimûne: Îro ro, koma helbestkarên jinperest û evînerperest bi berdewamî bi nivîsandina nameyên romantîzmeke bêbingeh û sexte, ku wê çu carî nehingivin armanca poetîk, tepikan waldigerînin.*

3- *England Your England, George Orwell, çapa duduyan, 1954, London, Martin Secker & Warburg Ltd.*

4- *"Pejirandina şaristaniyê bi her awayê wê bi pîrêzeyî wateya xwe ya pejirandina pûçbûnê heye.", Inside The Whale (Di Hundirê Nehengê De), George Orwell, gotareke heman berhemê.*

5- *Ehmedê Huseynî bi kar dianî.*

6- *Filîm an jî berhemên hunerî yên giriyokî.*

7- *Walter J. Ong*

8- *"Irishness is a form of anti-art." (Îrlandîbûyîn şêweyekî dijhuner e.), Helbestkarê îrlandî Patrick Kavanagh.*

9- *Rewşa Odeya Xebatê, Remezan Alan, Jiyana Rewşen, hejmar 36, Rêbendan 2000, r. 40*

10- *Tu, Mehmed Uzun, Amadekarê ji bo weşanê: Hasan Kaya, İthaki Yayınları, Stenbol, 2005*

11- *"Ev newazeyên ecêb î ew dibîne, nayên hesaban e, Ku serî ducanî ye bi ilm û îrfana helbestane."*

Ji Birayê Min George Re, John Keats

12- *Çend Dîmenên Xemgîn ên Kurmanciya Nivîskî, Silav Amed, Ehmedê Huseynî, 2004, Weşanên Aram, Stenbol, r.17*

13- *Sanat Edebiyat ve Kürt Aydınlanması, Abdullah Öcalan (Huner Wêje û Ronîbûna Kurdan), Evdila Ocalan, Sermawez 2003, Weşanên Çetin, Stenbol, r. 150*

14- *Ev beş bi boneya li Kurdistanê Bakur çapbûna Dîwana Ehmed Huseynî, li gel nivîsa Îrfan Amîda, di rojnameya Azadiya Welat de, di hejmara 356emîn, mêtûya 30 Sermawez – 6 Berfanbar 2002yan de, bi rasernavê Helbesta Temenê Gewre hate weşandin.*

15- *Berîya ku şoreşên me hebin, divê pêşî wehiyên me hebin!*

Nalîneke Xwînşîrîn

Berken Bereh

mirin dibariya ji esmanê bêmirês
feqîrî
penaberî
gulistan seranser mij û toz
gulistan li bin nîrê demsaleke boz
diariya
û aş û ba û çîrok
û kurmanciya xemrevîn
li ser agirê bindestiyê dinaliya

bayekî ciwan der bû;
deng ji senfoniya dengbêjan
reng ji mêrxasiya çîyan
her ku çû geştir
her ku çû bilindtir
her ku çû firehtir...
li etlase kurmanciyê konê xwe danî.

nalîneke xwînşîrîn e Ehmed Huseynî
ji xweliya sînemaya amûdê hîlbûyî
hawareke diltezîn e
li esmanê helebçe
guleke nepen û nûbişkivî
li meydana çarçira
rûbarek e Ehmed Huseynî
li geliyên dêrsimê destnimêja xwe bi peyva kurmancî hil-
dayî

di şevistana helbesta kurmanciyê de
çirûskek e Ehmed Huseynî
li vê sedsala giyankuj
li hember mîg, fantom, skorsky û gaza kîmyewî
bi xencera kurmanciyê desthilanî

bilbîlek e Ehmed Huseynî
di tunêla şeva sar a bindestiyê de
kilama azadiyê distrê.

Ehmed Huseynî

Îrfan Amîda

“...hetanî vê kêlikê jî, diyar e ko ez dê li Swêdê bimirim, lê ez dê li ku derê bême veşartin hê jî vê yekê nizanîm. Helbesta min ber bi van pirsan ve diçe...” dibêje di pêşgotina pirtûka xwe de Ehmed Huseynî. Û bi “...xwe amade bike/ da bablîsokên serberdayî yên ferhenga te/ bînçikandina

li helbestvên diçikîne. Cara yekem ku bête xwendin, mîna peyvên ji rêzê bin tene guhê mirov, lê di hundirê xwe de êrîşekê, hêrsekê jî dide der. Mirin çî qasî bédengî be, kêferat jê zêdetir qîrîn e. Mirin çî qasî westandin be, kêferat jê zêdetir livbazî ye. Mirin çî qasî hizin be, kêferat jê zêdetir coşî ye. Mirin çî qasî mêşin be, kêferat jê zêdetir serhişk e?! Mirin çî qasî tunebûn be, kêferat jê zêdetir hebûn e. Jixwe Ehmed Huseynî û helbesta wî, xwe jinûveafirandina ji dijberîtiyê ne. Xwe ji nû ve ji pirsyarkirina hebûn û nebûnê diafirîne ku helbest bi xwe jî li tixûbê hebûn û nebûnê kewgozeleke hov, pezkûvîyek e. Ger ku kesek nikaribe



min ji kêferata mirinê nas bikin.” diqedîne helbesta xwe. An jî dest bi afirandina pirseke ku ji kezeba “**çiyayên serhişk**” dawerivandiye, dike.

Her helbestkar bi hêsanî nikare peyvên kêferat û mirinê bîne nik hev. Lewra bêhnê

wê kewgozelê li wî tixûbî kedî bike, dê nikaribe gavê biavêje welatê helbestê.

Mirov dikare ji bo helbestkarekî mîna Ehmed Huseynî çî bibêje? Çawan ji wî fam bike. Goethe dibêje “*Ên dixwazin nivîsandina helbestê fam bikin divê herin welatê*

helbestê, yên dixwazin ji helbestkar fam bikin divê herin welatê helbestkar.” Dibe ku welatê helbestê û welatê helbestvên ne yek be. Dibe ku mirov nikaribe bayê welatê helbestê bikişîne kezêba xwe. Dibe ku mirov nikaribe bi fireke ava welatê helbestê bişikîne tîna xwe. Dibe ku mirov nikaribe destê xwe bide tîna welatê helbestê. Lê mirov dikare şestiliyên?! xwe têxe nav agirê Sînemeya Amûdê. Helbet mirov ji dêleva Ehmed Huseynî dikare biçe dizîya şebeş û tirî, dikare carinan ji dêleva wî li ser benderên pûş pal bide, dikare di çavên xezalê de bibîne yabo-yadê û mirov dikare li vir, li Mêrdînê, şana li ser hinarkê beriya xwe kedî?! bike û ji bîra wî bibe kulîlka bi barana êşa çiya dijî. Û ku ew welat Kurdistan?! be, tew mirov dikare kurbistirê jî.

Helepçe ye, Çarçira ye, Amûd û Amed e, Hemrîn, Hekar, Mehabad û Mêrdîn e. Qazî, Şêx Seîd, Zekiye, Seydxanê ker, Şehîdê zindana Hisicayê ye. Cegerxwîn, Mihemed Şêxo ye. Çiya, berî, rojhilat û rojava, başûr û bakur, serxet û binxet e, xetxetî ye. Pîvong û endeko ye. Keskesor e... kadiz e. Kew e?!

Li welatê Ehmed Huseynî, “bi tiliyekê mirovek -kî dibe bila bibe- tê kuştin... çavek -çi reng be bila bibe- tê rijandin... û bi tiliyekê jî, evîndarekî dîn dikare dîlbera xwe şanî biçûk û mezinên bajêr bide, dikare bi xwînê/ navê welatê xwe, li ser dergehên qalind, biçirisîne?

Dutilî ye welatê Ehmed Huseynî û mirov dikare “*bi sê çar tiliyan zikê yara xwe ji kenan biçirîne.*”

Gelek kes hatine welatê Huseynî. Bi lez hatine û çûne, lê pir tişt ji birine. “*û hatin?! ... “ çî bi lez in ko tên Qazî?!” Hatî! Destmal û dil bi hev re birin.*” Welatê wî serhişkî ye, lê “serê me ji lêvên çiyê nermtir e!” Heta ku bikaribe qala pîvazterkên Xursê bike jî dinase welatê xwe.

Wekî ku Goethe dibêje mirov bikaribe welatê Huseynî nas bike, mirov wê wêrekiyê di xwe de bibîne û çîrok û dîroka welatê wî fam bike, dê wê demê çêja helbesta wî ji bin zimanê mirov dernekeve. Wekî filmeke belgewart dîrok û qedera welatê xwe, wekî xalîçeyêke binexş lê rizyayî, wekî birîneke stewyayî ku çermê nû ji binî ve qalikê xwê dixurîne, wekî wêneyê êşa di nava bişirînê de û bişirîna di nava êşê de, wekî çîroka zarokên şoreşger, wekî şoreşa ku zarokên xwe dixwe li pêş çavan radixîne û lê vedibişire. Û ku mirov wêribe li wî û helbesta wî binere tê digihîje ku Ehmed Huseynî dibişire, ji serî heta binî Kurdistan e.

...

Mirov dikare kê-m-zêde fam bike ji helbesta Ehmed Huseynî, lê mirov dikare çî bibêje û çî binivîse li ser. Helbet mirov dikare bédeng bimîne, tiştêkî nenivîse, lê bédengî jî mirov diwestîne, nenivîsandin?! jî... Bêhna mirov diçikîne kêferata mirinê.

Helbestkarê pîrsê

Zivistana germ e/bîra mirinê ji/ baranê dipijiqe/piştî kêlikekê/ dê tava pîrsan raweste/ da ko dilê rastiyê bibirîqe!

Zimanê helbestê zimanekî berzekirî ye. Hem ji zimanê rojane, hem jî ji zimanê cureyên wêjeyê jî berzetir e. Lê bi ya min zimanê pîrsê, bi her hawî, hîn zêde berzekirî ye. Li mêjî û li dil û hestan dihingive. Balkişêr û mîstîk e. Di helbestê de jixwe divê estetîk be jî. Helbest ji pîrsên mîstîk ên takekesî û ji pîrsgirêkên ku ji wan pîrsan damezirandî ye derdikeve. Ev nayê wateya ku helbest tenê ji wan pîrsan pêk tê. Belê bersiv e jî helbest. Lê yên bêpîrs bêbersiv in jî. Helbesta bêpîrs û bêbersiv liberçavraxistîneke estetîk e, retorîk û newaya peyvane, lê ew qasî jî tamsarkî ye.

Di helbesta Huseynî de berî her tiştî pîrs bala mirov dikişînin. Mînak; di “*goristana teng*” de 16 pîrs, di “*bûka êgir*” de 10

pirs..... Pirsên Ehmed Huseynî pirsyarker in. Pirsyarkerên pirsgirêka heyîniyê...
“dizê hêlîna bêguneh kî ye?”, “dengbêjê hilata rohilat kî ye?”, “helbestkar kî ye?”....
dîsa di “bûka êgir” de: “kîjan zemînê ji sirûda serbixwebûnê re bikime pêşeng?”
“kîjan helbestê ji naskirina hebûnê re bikime sînor?, kîjan mebestê ji gewriya nebûnê re bikime tor?...” bi van pirsan hem dest diavêje hebûn û nebûna xwe, hem jî ya Kurdan. Nebûna di nav hebûnê de û hebûna di nav nebûnê de...

Veşartin?!

Pirs di helbestê de hem aşkerekirin e, hem jî veşartin e. *“li dinê tiştin hene ko ji aşkerekirina wan zêdetir helbestkar wan veşêre çêtir e.”* dibêje Goethe. P. Klee jî dibêje ku *“hunermend ew ê ku tiştên nexuyayî dide xuyakirin e.”* Ehmed Huseynî di helbesta xwe de pir tiştan aşkere dike, lê belkî ji wan pirtir jî vedişêre. Her du nêzîktêdayînan jî bi awayekî rewşenbîrane pêk tîne. Veşartinê car caran –wekî ku ava qeşayê bi ser mirov dake û veciniqîne- bi xalbendiyê aşkere dike. *“çend caran maçek bo min/ li ser gula xwîna te nehiştin?!”* bi van rêzikên jêrîn; *“hekar e?! / û hatin?! / ... “çi bi lez in ko tîn Qazî?! /.... “merqeda” te li ko ye Qazî/ta ko em bidînê berê xwe?!...”* hem rastiya gelê xwe aşkere dike, hem jî vedişêre. Dîsa; *“va ... dilbijandina xwe ji gerdana te/ berdidim/ va tu yê bibarî?!.... “ma rast e şeştiliyo?!...”* *“min bêriya serhişkî û beciriya te kiriye?!...”* Di van mînakên de jî xuya ye ku hem di rêzikên ku pirs in de û hem jî di yên ku ne pirs in de xalên pirs û baneşanê bi hev re bi kar tîne û me likayî rastiyeke hundirîn dike, lê pê re tiştin vedişêre. Mirov ku bi civaka xwe re lihev be, bi dema xwe re lihev be, nabe helbestkar. Ehmed Huseynî hem serhişkiya Kurdan, hem jî serhişkiya çiyayên Kurdistanê tîne zimên. Ger çi qasî êş û birînên Kurdan tîne zimên jî, bi qasî wan rexneyên tûj lê dike û nelihevhatina xwe diyar dike.

“rojhilat di xeftanê te de asê bûye!
Roava di çepkên te de çêbûye!
Bakur ketiye paş çeperên şevê!
Başûr bûye leheng û hozanê revê!”
 an jî;

Kurd?!/Kurdistan, an kurdistiran/
 gêrikên bêmoristan/ tiriyên mezrone û/ lêva
 sedsaliya bîstan.

Dema ku dibêje;

“xewna te li ku ye xwedêyo?”..... “... yezdanê pak û dîlzarokî/ xwedanê not û neh navê fediyokî/ ketiye serê dîlanê Hekarê....”
 nelihevkirina xwe û yezdanan û dema ku dibêje;
“.... pêwîst e evîna xwe ji bayê reş, ji pençên/ sedsaliya bîstan biparêze...” jî nelihevkirina xwe û demê diyar dike.

Sembol, heyber û bûjen

Lê bi ya min helbestkarek dema vê yekê bike, divê tiştên ku li hember derdikeve, rexne dike, an jî înkâr dike baş bizanibe. Ger baş nas neke an manîpule dike, an jî deformasyoneke ne estetîk bi kar tîne. Mînak: ger Dalî têgiha demê, rastiya wê û ya xwe baş fam nekira, dê nikaribûya ew qasî bi estetîkî katjimêr deforme bikira. Ev yek ne tenê ji bo têgihan divê. Di helbestê de ji bo simbol û tiştan/heyberan jî divê. Ehmed Huseynî di helbesta xwe de simbol û heyberan, bûjenên tazî bi kar nayne. Mîna yezdanekî ruh dide wan. Ne tenê ji rengdêr û peyvên alîgir, komika peyvên çêdike û wan şanîdêr dike. Rasterast ruh û kesayetiyekê dide wan. Her tişt li ba wî zindî ye. Mîna anîmîstekî rastiya hundirîn û ya derveyînas dike, wateyê di ruh de dibîne û ji wî ruhî hêma û metaforên xwedîwate û bifelsefe diafirîne. Mînak: *“nema şîrê çîyan, berfê nas dike!!! hêlîna biharê/ hişê kevir/ zikê kevir/ baskên bihara birîndar/ bêhişîya xerdelê/ tava te keziyan dihûne/ hişê stranê/ barana tirsokî/ tarî digazine ji tarîtiya xwe/ lêva sedsaliya bîstan... û hwd.*

Mebesta min ne ew e ku bibêjim Huseynî anîmîst e. Mebesta min ew e ku bibêjim Huseynî bi famkirin û naskirina bûjenê, veguherandineke diyalektîk saz dike ji bo bûjenê. Gavekê bi ser rastiye dikeve, an jî berê xwe dide rastiya berze. Rastiyeke berze diafirîne di helbesta kurdî de.

Çawa gihîştîye vê yekê?

Têkiliya helbestê bi felsefeyê re heye, lê helbest ne felsefe ye. Huseynî jî ne tenê bi felsefeyê berê xwe daye vê rastiye. Helbet amûrê helbestê peyv in. Ji bo ku bigihîje vê rastiye bi qasî ruhê heyberan, ruhê peyvan jî nas kiriye. Ziman ji derveyî hişê xwe kiriye rastiyeke. Etîmolojiya peyvê û dîroka edebiyata kurdî, ya devkî jî, baş nas kiriye. Loma ew qasî bêhna dengbêjiyê jê tê, jixwebawer dibêje ez dengbêj im. Ji hêla hevoksaziyê ve mirov bala xwe bidîyê, di gelek helbestên xwe de (mînak:wexta ko) pir nêzî hevoksaziya dengbêjan e. Jixwe helbestkarekî ku edebiyata xwe ya klasîk û ya devkî nizanibe dê nikaribe bi zimanê xwe deriyeke nûjen –lê tendurist- ji helbestê re veke.

Me gotibû zimanê helbestê hem ji yê rojane, hem jî ji yê cureyên wêjeyê zêdetir berzekirî ye. Ehmed Huseynî zimanê xwe, li gorî helbesta kurdî, hem di warê hevoksaziyê de, hem di wateya rêzik û peyvan a aşkere de û hem jî di rastiya wan a kûr de, ji zimanê ku em hîn bûnê vediqete û balê dikişîne ser xwe. Bi vî hawî ji dêvla ku rastiye di çavên me re bike me di çavên rastiye re dike û bi awayekî din wê vedihone. Bi vî awayî jî di helbesta wî de “defamîliarîzation” wekî taybetiyeke wî dixuye. Taybetiyeke wî ya din jî ew e ku bi zimanê vegotinê çîroka helbestê jî diyar dike.

Strancoşî ye helbest

“*helbest stran e*” dibêje Caudwell, “*fan-teziya helbestê hêmaya civakî ye*” û dîsa dibêje “*helbest coşa kolektîv e.*” Lê ji bo ku



helbest bibe coşiya kolektîv, ne hewce ye ku helbestkar bi hişmendiyeke kolektîv binivîse, an jî bistirê. Jixwe helbestkar ew e ku derdikeve derveyî hişmendiya kolektîv. Helbest ku birîneke kolektîv, cejneke kolektîv bi ziman û hişmendiyeke takekesî jî bîne zimên, têra coşiyêke kolektîv dike. Ehmed Huseynî jî bi hişmendiyeke takekesî û nêziktêdayîneke taybet û nazenîn mijarên kolektîv tîne zimên û ev yek jî têra coşiyê dike.

Strane jî helbesta Huseynî, lê ne tenê zimanê wî yê dengbêjî ku car caran bi kar aniye, bi qefaltina rîtma peyvan jî helbesta xwe kiriye stran.

*“Biskên li ba
masiyên gola
tînin sema....”*

*“bi bayê ber tavê/ bi çariya lavlavê/ bi
hişkiya silavê/ sorgula min/ sosreta min/
derbesta min/ darbesta min/ ko dûr bim/
bilûreke bêhiş bim/ bo çavSORAN çûr bim/ û ji
nişka ve gwîzan û devê şûr bim.”*

*“şev şînan şîn dike
hedan hêviyan hîn dike
bahoz biharê bîn dike.....”* an jî

*“şeva bê kelek
pêlek ji birca belek
pîte pîta bayê felek”* û mirov dikare têra xwe zêde bike van mînakên.

A soxî; gelo mirov dikare peyvin derxe û bibêje ev peyv stûnên helbesta Huseynî ne. Peyvên mîna berxikên mîjo, serzer, çavreş, şigêr... û qirşikek jî di nav liva wan a spîboz de tune ye û yek jî jixweber nehatiye li wî nebaniyaye. Loma mirov nikare yekê jî ji xwe re jî nav wan bidize?!...

Nîşeyêke ji bo Ehmed Huseynî:

*“nebî nebî ku zaroktiya we li welatê mişextî
û mirinê?!biderize!”*



**Ji Bo Poetîkaya
Ehmed Huseynî
Pêncî û Yek
Deqdeqûsk
(1955 - ...)**

Lal Laleş

**1. Hêmayeke ku dengê bîra
hundir, labîrenta binhişînê
dibilîne elîfbêtkî helbesta
Ehmed Huseynî ye.**

**2. Serhildanê dike
lerizîna peyvê. Ruhê
zimên diselîhîne.**

**3. Keldûmana hêmayên wî
yên ku xwe bi awayekî
bihêçkêketî dinehwirîne ji
bo mêjî, hest û asoya
mirov metirsiyek e.**

**4. Li sirgûnê welatê xwe
ava kiriye, ji ber ku welatê
Ehmed Huseynî zimanê wî
ye.**

**5. Wêrekî divê ji bo ketina
nava xaka Ehmed
Huseynî, ji ber ku
awêneya ji herfan pêkhatî
dibe sersebebê
lixweşûrkişandina mirov.**

**6. Valahiyên li wargeha
ramanê bi bend û
nameyên xeyal û hebûnê
bi nikulê baz û kewê xwe
tije dike. Lê dîsa jî xof û
valahiya hundirê mirov
kêm nake.**

**7. Çîroka me vedibêje,
çîroka me dîsa vedibêje, di
ber re çîroka yên din jî
vedibêje.**

**8. Peyvên wî xwedîbask
in. Hişê me ji asîmanê axa
birîndar heta**

**Skandinavayê digêrîne;
serencam, birîn, derbirîn,
firînnnnnnnn...**

9. Tiştê ji ebadê benderuh
xuya nabe pê dide
xuyakirin.

10. Ehmed Huseynî, di
serpêhatiya xwe ya
dûvedirêj a helbestê de
nepeyiviye, nivîsiye. Ango
ristên xwe ji merheleya
peyvê (zimanê devkî,
folklor) derxistiye lûtkeya
nivîsê.

11. Li hember tariyê
mûmên rewşenbîriyê
vêdixe. Li hember azar,
lêdan, bindestî, têkçûyîn û
hwd. ala helbestkariyê
diçikîne.

12. Ji Mêrdînê Amûdê
dibîne, ji Rewandizê
Mehabadê dibihîse, ji
Stockholmê pireya Pragê
dihîsîne.

13. Ehmed Huseynî;
Meded e, mededa xewsa
Amed e.

**14. Prossesa sexte deşîfre
dike.**

15. Bi deqê xwe heye û ew
tunebe jî dê deqên wî
hebin.

16. Di keftûlefa jiyanê de
pîrsê li pîrsê zêde dike bi
ezmûnkariya xwe.

17. Ew û Melayê Cizîrî
hevalên hev ên medreseyê
ne û di hemû betlaneyên
jiyanê de li dewsa xwe
natebitin, mîna şagirtên
şûm. Hey û hey bi pey ruhê
kurmancî ketine. Mela û
şêx ruhê kurmancî bi dêt
xistin, lê ruhê me jî
stendin.

18. Kakil û kêlî vekîteya
ferhenga Ehmedê Huseynî
ye.

19. Amed bi şîr û şekir
xwedî kir, lê Amedê 'wî
uzmîş kir,' lê wî dîsa jî şîr
û şekir ji lêvên me û
Amedê kêr nekir.

20. Naverok, vegotin,
kakil û şeweya di heman
çarçoveyê de bi cih
kiriye. Helbesta wî û
helwesta wî ne
weslewesle ye, tevahî ye.

21. Di zimanê wî de
bûyerên civakî, polîtîk û
takekesî di nava hev de
hatiye honandin. Lê
bingeh mirov û kesayet e.

22. Romyaya welêt e.

23. Bi saeta kurmancî re
diaxife. Wext ji wî re
bûnewerî û derbirîn e.

24. Hesabê helbesta xwe
baş ji hev derdixe li
fezaya afirîneriyê.

25. Ji zuriyeta Cizîrî,
Octavio Paz, Boudelaire,
Rimbaud û Ritsose

26. Li Riroyê bi destê J. L.
Borges digire û xwe li
sînore xewnên mîtolojî û
rojhilatî dixê.

27. Deriyên helbesta wî
rewrewk e. Ji dûr ve
lênihêrînê rê dide mirov.
Nêzîkayî lê kirin Keleha
Alamûdê ye.

28. Xaşxaşa helbesta
kurdî ye.

29. Hêleke wî ji rojhilat
hêla din ji rojava dikeve
bajarê dirinde, lê ji bajaran
difire dernakeve.

30. Bi awayekî ji awayan
kulê vedibêje vegotin û
çîrokîvegotin di helbesta
wî du teknîkên girîng in.

31. Welat awêneya wî ye.

32. **Helbest ji bo wî
dawerivandin e, azmûn e.**

33. Bi xwendina helbesta
wî xwendevan dibe xerîbê
ferhenga xwe ya kolektîv û
neçar dimîne ku bi çavekî
din li xwe, li peyvên xwe,
li xezneya ferhenga xwe
binihêre û peyvê ji nû ve
bi nav bike, nas bike.

34. **Cihokên di navbera
hişê wî û zimên de bi
awayekî tendurist
diherikin.**

35. Dengê helbesta wî
teqla hundirê ristên wî bi
bîrxistin û îmajên helbestê
qewâtir dike.

36. **‘Heqeten’ çi ye
hejmara giyanê Ehmed
Huseynî?**

-07, 40, ..., 1001 an ...

37. Kula wî ya mezin
Selîm Berekat e ango
Sîsirkên Hesinî ye. Hewl
dide ji bo ku Selîm
Berekat di kurdî de bi
gewde bike.

38. **Neynokên
matmayînê, ew ê nehêle
çolistan kordunde here.**

39. Mûsîkiya hundirîn û
şêweya raza helbesta wî
ye.

40. **Nêzenasê dûriyê ye.**

41. Xelekên zimên her ku
dihere fireh dike. Kuliyata
wî stûna zimanê kurdî ye.

42. **Di zanîngeha zimanê
çivîkan a Nebî Silêman
de, muderîsê beşa kurdî
ye. Ew çivîkan fêrî kurdî
û çivîk jî wî fêrî firînê
dike.**

43. Zilindar û êvarê hêlîna
xwe li paxila te çêkiriye.

44. Gava hûn li
Qamişloyê li ser termê
xewna Laleş diciviyan,
Lal li Amedê birîna gulê
derman dikir.

45. Neynokên matmayînê
rûyê kîjan paytexta me
birîn dike.

46. Payîzên gumanê li
kîjan zemînê destana
evînê diwelidînê?

47. Tu hêja yî...
Tu bilbil î...
Lê tu helbestkarê ker û
lalan î.

48. Ferhenga kêferatê
dinazile ava Dicleyê, te
got erê Ehmed?!

49. Helebçe bi pey stêrkên
dixurice dikeve li mistek ji
şîna bêcir.

50. Êvar û Bazyar mûmên
bêrîkirinê vêdixin ji bo
em bibînin sûretên
şikeftên çiyayên
hezkirinê.

51. Xweliya Fesîhê Seyda
û Kesrayê Ebdê bi peyvên
te disoje giyanê me. Dohn
zêde dîkin li qendîla
helbesta me ya hestiyar.

52. Helbestên te, lerizîna
ristên te, gulvedana
ferhenga te, giyanê
ziwabûyî yê kurdî av
dide.

53. Kewistana namûsê
berê xwe da velerizîna me,
me berê xwe da ku?

54.



Şevbaş ey şev!

Ehmed Huseynî

Kelehên şevê,
yên ji kevirên xilmaşiyê,
yên ji awaz û lorînên sergoman, bi raperîn û jena lêvên te yên beybûnane dorpêç
dibûn
û min nedixwest
stêrkên çavên te ji hêlîna tirsê min bifirin,
min nedixwest serdemên eşqê bi matmayîna min û te bikenin.
Min çîroka ku di çeşnê mirinê de bû ji pasvanên rewrewkê re hildibijart û min bejna
dastana xwe bi sîbera bişirîna te ya reviyayî dialand.
Min gulistanên ziwabûyî yên xewrevînê,
evîna sersom a ji kavişên şewatê, bi ser rakêşana porê te de direşandin
û min giyanê te yê ji xweliyê bi ser serê xwe de dadikir.
Kelehên reş ên bêrîkirina min û te
di kuçeyên westana şevistanê de ber bi bêhûdeyî ve winda dibûn,
lê gavên me yên ji raz û afsaneyan ber bi laşê çiyê ve diherikîn
û destên me yên mihreban di destê şoreşa dîn de bêdest û sermest diman.
Min ewrên bîranînan di esmanê awirvedanên te de didîtin, lê roavahiya derengmayî
helkehelk û pîkuliya sînorên min û te bi bendên xwîn û xatirxwestinê,
bi baskên şikestî yên çarenûsê, nîgar dîkir.
Tu bi hilatina bêhna şevistanê re dihatî
û tu di qebqeba dilê min de hildibûyî..
Ez jî, ji gerdana şevê, ber bi kula şevê ve dihatim û di nêçîra navê xwe de lal dibûm..
Û hespê min ê birîndar cendekê Xalê min î kuştî ji nav mayinan bi xwe re dianî û
tembînameya kulîlkên bejî di qîrîna min de dadîçikand..
Ez û tu û hespê sosretê, darbesta ji gulwaz û zersonên bîrê û goristana stêrkên ku ji
biskên te bi ser lavlava min de dirijîyan, a niha, li ber pencereya şevê û di quble-
nameya şevê de, şevgerîna şûnewaran û şevbihêrka evînkujan ji ber dîkin.

De ji ber bike ey Goyînê paytextan!
De ji ber bike ey ji bermayê bêbextan!

Min lêvên te ji serîhildanê dixwestin,
da ku keriyên tozgirtî ji dudiliya pirsê rizgar bikim û stêrka karwanan di axa pîtanokên
te de biçînim.

Min destên te ji reşebayê tirsê dixwestin,
da ku rojçêbûna aliyên wêranê
û li xwemikurhatin û rojmirina helbestê li ser velerzîna wan bikulim
û xelwetgehekê bo gunehkariya xwe li ser kenarên laşê te ava bikim.
Min porê te ji desthilatiya nemanê dixwest,
da ku pirtûka têkçûnê bixwînim
û dapîrên narîn ên ku li ber avê diçûn bibînim
û di çemên cegerdar ên hişê te de hînî tobedariyê bibim.

De ey çemên ku di navbera me û hembêzkirina karexezalan de ziwa dibin!
De ey kêlîkên pêlvedanê yên ku di xuşîna temenê me yî rizyayî de giranbiha dibin!

Şev e ey neviya serberdayî ya binemala şevê!

Bajarê te yê ji çûkan di kirasekî reş de digevize.
Minareyên axînkêşanên te yên ku di sînga min de deng vedidin,
reş in.
Berzûrî û hawarhawarên te yên ji mermera çavlirêmanê,
reş in.
Me birînên xwe bi navê Zîna reben haş dikirin,
lê goristanên dostan û naçariya dayikên li ber kêlan dihatin bîra me.
Me xewn bi xewnê ve didirût û me gupîtka çîyan bi çîçekên hesret û seferê
dixemiland.
Me li dîrokê temaşe dikir
û em bi hev re digiriyan.
Ez û tu,
cêwiyên şevistana Skandînavyayê
û mîratgirên dibistana erênayê,
evînbazên bêstran û şehîdên bêşînîgirî.

De were rîspiyê gumanê,
de were eşqa "Selma"yê ji vê hîva xemgîn re bibêje,
de were agirê xewna xwe di dilê min de vemirîne,
li ser laşê ciwaniyê zikra bêdeng a Botanê dubare bike
û kevokên bendemanê ji riha xwe ya spî ber bi kelehên şevê de bifirîne.
De were da em bi hev re ji şevê re bibêjin:
Şev baş!

Ehmed Huseynî: Şêxê Helbestkarên Kurd

Sebrî Silêvanî

Xwendineke kurt di dîroka civaka mirovahiyê û diyardeya afirandinê de: Ehmedê Huseynî wek ezmûneke takekesî

<Tenê di civaka nesaz de, bihayên mezin dibin qurban ji bo derbirîn û bûyerên biçûkî> Hegel.

Afirandin diyardeyeke takekesane ye di civakê de, ast û radeya wê heye. Belê ew ast û rade li ser hindek binemayan dimîne: xwendin, lêkolîn, zimanê peyamê, zimanê derbirînê, awayê pêkhatin an avakirina kesayetiyê. Her wisan hewl, zeyn, perwerde û aşînbûn.

Lê binemayê sereke azadî ye. Belê berî azadiyê pêgirî pêwîst e: pêgirî bi encama mîlmilanê û nakokiya dêrîn li gel xwezayê di hersê qonaxan de.

Di civaka saz de azadî bahane ye ji bo kamneyek biha wek afirandin, an dahênanê. Belê di civaka nesaz de azadî bûye mebest, mebesta herî pîroz li demekê ku pîrozî bêwate dimîne li hember gumanê û pirsyan.

Her wisan pêgirî bi xwe jî, gava ku mebest be hîngê dibe asteng di rêya werarê de. Belê gava ku behane be hîngê dibe hokareke erênî, kes, ji bo werar û pêşketinê.

Ji bo civakî wek damezirîngeh, azadiya rêjedar gerek e, belê ji bo takekesê/a afirîner azadiya berdâr û bêpayan gerek e (1). Afirandin diyarde ye û lewaneye ku ji zemanekî ji bo zemanekî din, ji cihekî ji bo

cihekî din, tenanet ji kesekî jî ji bo kesek din cuda be. Belê azadî ne diyarde ye û rahîna wê wek maf bi awayên ciyawaz nabe behane ku rûber an endazê wê wek têgih bê guherîn. Belê belkî wek alav û awa û ew jî li gor taybetmendiyên her civakê û zemîneyê ku xwe li ser ava dike.

Hemû civak: civakên saz û yên nesaz, beşên hevteyav in ji civakê mirovahiyê yê kevnar û civaka Kurd jî her wiha. Û ezmûna wê civaka kevnar diselmîne ku derketina ji yasayên akarî (exlaqî) encama nepêgiriye ye, her wisan encama wergirtina mafê azadiyê ye û awayên bikarhînanê û niyazên li pey e, ji ber ku azadî bihadar e û di civaka saz de, civak bi xwe bihayê wê dide belê di civaka nesaz de takekes bihayê wê dide û tenê wiha bandoreke nerênî(neyînî) digihe bizava diyardeya afirandinê.

Nexwe, azadî binemayê afirandinê ye. Belê afirandin binemaya takekesî ye û takekes jî - bingeha berdewamiyê - berhema wê mîlmilanê û nakokiya dêrîn e di navbera xwe û xwezayê de.

Ew takekes - mirov - ji kevn de hewl dide ku bi awayên cuda cuda xwe pêşkêş bike û her car jî bi riwaletê (serûberê), bi zimanekî, bi amrazekê heta ku di akam de digihe asteke bilind û ew jî bi karîna damezirandina civaka sivilane.

*Civaka sivilane çawann hat damezirandin?
Civaka sivilane li çi dirûwanîne?*

Pirsyarên asan û sakar in ku evro (îro) bi bêhtir ji zimanekî dihên (tên) wergêrandin û her neteweyek, çandek li gor taybetmendiyên xwe bersîvan amade dike. Bi taybetî yên ku demên tengav derbas kirin û niha di demên fireh de li asoyên dûrtir û bilindtir dirûwanînin.

Pirsyar di tengaviyan de peyde dibin. Belê bersîv di firehiyan de (2). Lewra ya qenc ew e ku civaka Kurd tenê pirsyan berhev bike, çimkî hê di qonaxa lixwegerînê de ye, werarê dike, hê bînasname ye, bîyasa û bîsazî ye. Belê di heman demê de wek amajeya li jor, dimîne beşek hevteyav ji civaka mirovahiyê.

Dîroka civaka mirovahiyê dîrokeke dêrîn e û ji sê qonaxên sereke pêk tê:

1- Qonaxa Xwezayê: *di vê qonaxê de yekîtiyeke sade û sakar di navbera mirov û xwezayê de peyde dibe belê li gel salgarê, di berdewamiyê de, mirov bi espayî (hêdî hêdî) di xamoşeke (bêdengî) karîger de dibuhuje (asîmîlasyon).*

Li derveyî memleketa ruh û dûrî hizr, ziman, xewn û xeyalê, xweristeyê aferîdeyek dengdar bi ser nasnameya wî de digire û li dawiyê kêma ciyawazî di navbera wî û ajal û dar û beran de dimîne bi kêmayî ji aliyê wateyî ve,

ango, mîna her aferîdeyeke din; dixwe, vedixwe, dinive û peresendiyê (tuxmê xwe berdewam dike) dike.

Bi rûxsarî, bêhewes û bêwaz reftar dike heya ku zêde kehî dibe, tenanet li gel diyardeyên xwezayê yên tirsar ji û wiha hevguncandineke sar û neyînî çêdibe û ew hevguncandin bi awayekî din wateya xweradestiyê dide.

Li gor bûyer û guherînên demsalan, her wiha li gor pêdawîstiyên qonaxê, bînewa (bêhêvî), tenê cestê xwe bi kar dihîne (tîne) lê giyan û hizr û zimanê xwe feramoş (îhmal) dike, lewra giyan, hizr û ziman heya radeyekê dihên(tên) pûkandin (genî, xerab) û mirov riswa û bêçar dimîne.

Ew yekîtî û hevguncandin di navbera mirov û xwezayê de, bûbû sînoreke bilind û qalind di navbera mirovî û zatê wî bi xwe de û di akam de sinc û saxletên xwe yên taybet ji dest dide.

Lê dawî ku lanewaz (bêcih) û derbider dimîne, bêqam li ber xwe dikeve; posîde û bêhêvî dibe û bêhemd ji xwe havî dibe: havîbûn derdê herî mezin bû ku mirov di wê qonaxê de bi çavê serê xwe bibîne.

Erê... çarenivîsê wî berziyan û berneman dibû, belê nedizanî penayê ji bo kê bibe û bêhewl û helmet alaya spî li beramberî xwezayê hilgirt, lê xweza, wek desthelatdarê bêhevrik di dema kêrhatî de reftar dike: wê rewşa riswa ji bo mirovî li ser xwe napejrîne û rola perwerdegarî - ji bo yekem car di dîrokê de - pê radibe û yekem waneya (dersa) sûdbexş nîşa mirovî - şagirdiyê

debeng - dide.

Ango, bi ser hev de hurgumand û dixwaze ji bermayên pêkhatayan hebûneke nû ava bike!

Bi qurbanî û destpêşxerî, bi alavên xwe yên taybet, cextê li ser xilasiya wî dike û ew jî bi bûyera Tofanê di serdema Hezretê Nuhî de, li qonaxa dûyê.

2- Qonaxa Tofanê: *qonaxa duyemîn e ji temenê milmilanê û nakokiya domdirêj û tê de ew yekitiya sade û sakar bi bûyereke sertaserî - Tofan - têk diçe.*

Bi niyazdarî, xwezayê sext pirs û niyara mirovî dike tevn û rêsandinê, wek kardarî, ji bo wî bi xwe dihele bi hêviya ku mefayî ji waneyê werbigire, lê çawann?

Bûyer ji aliyê ayînî û metodolojî ve sîza bû ji bo tawan û sîkarên mirovî, belê ji aliyê felsefî û dîrokî ve berpalî û çaresazî bû, eger çî bi awayekî nerahatî (nebaw, ne normal) jî.

Rast e ku mirovî wek hebûn û gewher li destpêkê dorand û ziyaneke mezin giha wî, lê belê li domahiyê hêz û tiwanayên (karînen) xwe yên nepenî derxistin û bûyera tofanê bû dûrêyana temen û bizava wî wek ademîzadê bijarte.

Bûyer bi tundî hestên wî dicoline (dihejîne) û han dide (gur dike) ku hizr û ramana xwe bi kar bîne û pirsyaran durist bike. Hewl dide ku êdî ji dil serederiyê li gel barûdax û dorhêlî bike û rewşê bi awayekî nû bihelsen-gîne, ew jî bi berawirdiya encaman li gel meram û awatên xwe yên nû.

Giraniya bûyerê û wêraniya hêwirgehê, her wisan derizîna bûneweriyê û kêmahiya berheviyê, tevî pal didin ku sewdaya xwe, xeyala xwe, bi kar bîne da ku bikare ezmûn û bûyerê wek pêdivî têbigihîje û sedemên wê bi wateyên kûrtir ji qeza û qederê analîz bike û îcar awayên serederiyê û alavên çak-saziyê li gor vebibire.

3-Qonaxa Serketinê: *di vê qonaxê de, qonaxa sêyemîn û dawiyê, mirov neçar radipere (serî hildide) û di encamê de serketina xwe, berwext, diselmîne.*

Wek pêkhate ji giyan û sewda, cih û payeyê xwe dabîn dike û nimûdariya (maqûlatiya xwe) xwe li ser hemû cûnên aferîdeyên din diçespîne. Dixwaze wek dîrok bi şanazî ji bo berebavên (nifşên) dûvhatî rabighîne. Belê çawann û bi kîjan zimanî? Ev qonax, qonaxa bilindbûna giyanî û saziya hizrê ye (3).

Venasîna (li xwe mikurhatin) mirovî ji bo alûzî (xembarî) û dorandina (ziyandarî) wî li hember xwezayê aloz (girêbest) bi serê xwe destpêkek bû: destpêka yaxîbûn û serhildanê berev qonaxek nû.

Werar û peresendiya cîhana wî, zimanê amajeyan li ba wî durist dike û hizra wî berela dike û îcar hizr bi xwe di asoyên berfireh de bisteh dibe û hemû hişeyên din: bînahî, bihîstin, hest û bêhn, li pey xwe dihêle û hindek hevsoziyê qezenc dike. Hizr dibe sermaye (kapîtal) û çekê herî bihagiran ji bo xweparastinê li ba mirovî. Belê, xuya ye ku ew çekê mirov tenê yek carê pêwîstî pê hebe gerek e bi dirêjiya temenî peyde kiribe (4).

Hizr wiha berdewam dike heta ku hevrikiya ruhê jî dike. Li gel zengilê metirsiyê, giyan helwest û reftarê kêrhatî vedibire: ji bo ku cihê xwe mikum bike, hewl dide ku serî ji hizrê bistîne belê çawann?

Bi rêya bestina (sazkirina) hevpeymaniyê di navbera bawerî û gumanê de û bi hevkarîya aliyê sêyem, belê aliyê sêyem kî ye?

Ji bo ku giyan hindek hevsengiyê (tewazinê) peyde bike, aliyê sêyem pêwîst e!

Hizr dikare peyamê pêk bîne, belê kî dikare wê peyamê derbibire û rabighîne?

Peyama serketina mirovî li ser xwezayê.

Eger hizr pêkhînerê peyamê be, nexwe ziman derbirîner û ragihînerê wê peyamê ye, lew, giyan aliyê sêyem saz dike û ew jî ziman e û wiha hizrê li ba hindek sînorên taybet radiwestîne, wek sînorên xwezayê (5).

Giyan dixwaze bi rêya zimanî rabighîne ku bûyer bêhtir bi nepenîyan ve girêdayî ye û tek derwaze ji bo yê nepenî giyan e. Lewra bi awayekî maqûl û rewa xwe dide nasîn û bi ser hizrê û zimanî de zal dibe heta ku digihe pileya herî bilind. Belê di heman demê de, bi emekdarî, kêr her duyan dihê: hizrê nû dike û zimanî jî rewan dike.

Li dawiyê giyan seng û heybeta mirovî

-aferîdeyê dengdar - ji bo vedigerîne û rûyê wî spî dike dawî ku wî bi xwe bi nezanîn reş kirî û wisan mirov berdewam dibe û dîroka xwe bi diyardeyên afirandin û dahênanê dewlemend dike bi taybetî di bîndariya pêdiviyên civaka mirovahiyê de wek: huner, wêje, muzîk, zanist û werziş û hwd.

Reng e ku (dibe ku) têbînî yan têraman li cem xwendevan çêbibe û ji xwe bipirse: erê ev nivîsar li ser dîroka civaka mirovahiyê ye, yan li ser diyardeya afirandinê ye, yan jî li ser Şêx Ehmedê Huseynî ye?

Ma fê xwendevan heye vê pirsyarê araste bike ji ber ku ne ji valahiyê hatiye.

Serbasê nivîsarê wek ku xuya Şêx Ehmedê Huseynî ye wek helbestkar û ezmûneke takekesane, belê ew ezmûn bi xwe diyarde ye di cîhana me ya kêmafirandin de.

Ezmûneke berfireh û têr û tesel e, ji ber ku: wêjeyî, sosyolojî, roşnayî, felsefî û perwerde-hî ye. Lewma ez neçar bûm ku bi hûrayî û razdarî amajeyê ji bo derperîna (pêngava yekê) seretayî bikim û her wisan destpêka afirandinê û peywendiya wê li gel giyan û hizr û zimanê mirovî.

Ez bawer dikim ku sanahî ye ku ez nivîsarekê li ser Xanî, Cizîrî, Nalî yan Mewlewî amade bikim ji ber piraniya jêder û çavkaniyan. Belê ne sanahî ye ku ez nivîsarekê li ser Şêx Ehmedê Huseynî, Bextiyar Elî, E. Pêşew an Ş. Bêkesî amade bikim, ji ber nebûn an kêmahîya jêder û çavkaniyan û ew jî daxê mezî e. Belê nayê wê wateyê ku li rojgarekê ezmûnên wan ên takekesane di biyavê wêjeyê de li dibistanan wek peyrew neyên xwendin.

Ez ê tenê li ser biyavê wêjeyê bisekinim û ji wêjeyê jî tenê li ser helbestê, çimkî helbest dê min berev giyan û hizr û zimanî ve bibe û îcar wek pîr, dê min derbasî cîhana Şêx Ehmedê Huseynî bike û li îstgeha bendemana wî. Ez û giyan û hizr û ziman wek hogir û demsaz di karwaneke mereqdar de li wî yê nepenî bigerin..

Şêxê Huseynî ye Ehmed e

Car çiya ye û bilind e

Rêya wî dûr e

Car derya ye û sehend e

Kûr kûr e.

Ez newêrim bilezînim ji ber ku mirovê helbestkar samdar e û cîhana wî nepenî ye, lewra mafê min heye ku ez bi espayî, berev derwazeyê cîhana wî biçim, berev raz û gewherî, berev ruh û hizr û zimanî, berev mirovahiya bedew, berev mihraha helbestkarê mirov û şayeste biçim û bi yadê we silava helbestê arasteyî wî bikim. Kat û dema ku ez wek xwendevan Şêx Ehmedê Huseynî dixwînim û wek nivîskar ji wî dinivîsim, bêhemdî xwe, di sêlayê (sêgoşeya) mikum de ku ji ruh, hizr û ziman pêk tê, ez xwe dibînim. Bûye (ji ber hindê), min bi hewes dest pê kir û temen û rayelê her sê aliyan bi rûdan û qonaxên cuda cuda bi bîr anî. Şêx Ehmedê Huseynî jî wek hindê helbestkarên hevkat û hevast, bizava kêlîka demê zeft dike û hewl dide ku li vê salgara tengav birek pirsyarên çarenivîsî derbarey gewher û kamneya hebûnê biwirûjîne (biarîhîne) bêyî ku li benda bersîvan bimîne, ji ber ku wek helbestkar: bersîv ne karê wî ye, belê pirsyar sermafê wî ye. Hemû tuxmên wêjeyê bi taybetî helbest û romanê, heya radeyekê û bi şeweyekî yekser, peywendî li gel peresendî û werara giştî heye wek: civakî, perwerdeyî, aborî û tenanet siyaset:

Peresendî x werar = Afirandin

Riswabûn x asta nizm = pûkandin

Seqamgêrî û tenahî x tebat û kar = nûbîn û nûbûn.

Lewra ji ku hatiye gotin: her civakek bi pirs û pirsyarên xwe heye.

Her civakek bi pirs û pirsyarên xwe tê naskirin.

Kes nikare nikûliyê bike ku civaka mirovahiye pêş ketiye û dahênan bi awayekî rojane berdewam dike. Belê hê nikariye tenahî û asûdeyîyê ji bo mirovî dabîn bike bi taybetî ji bo mirovê asan: ê dawênkar û nalebar.

Pirsyar: Ji ber çi?

Reng e ji ber ku ew pêşketin û dahênan bêhtir di barê teknolojiya zanist û rêxistinê de ye û reng e jî no! Lê, bersîv ne girîng e bi qasî girîngiya pirsyarê.

Ew mirovê asan û bînewa, binistira komelgehê mirovahiye, pêkhate ye ji: ruh, hizr, ziman û her wiha hest û derûn û hwd...

Lew, aferîdeyeke taybet e, belê bi dax e ku li gel rojaneyê cîhanbûnê ew pêkhate hêdî hêdî ji hev vediqete.

Wek hebûnekê jî risteyeke dirêj ji pirsyaran derbarey firzende û gewherê xwe hildigire û her pirsyarek mîna xelekekê mikum û daxistî ye û heya niha hê nehatine qetandin. Ew pirsyar bêhtir bi cîhana mîtafizîkî ve girêdayî ne. Walter bi rengekî neyînî, li catê bersîvê, amajeyê dike û Sarter jî bi reşbînî werdigere. Belê heya niha ev pirsyar hê li bersîvan digerin, lê ne di çarçoveyê ayîn û felsefeyê de ji ber ku nikarîne û hergîz nikarin bersîvan peyde bikin çunkî pirsyarên azad in û sinorên xweza û sewdayê mirovî derbas dîkin belê, tenê giyan azad e û li ba sinorên xweza û sewdayê mirovî ranaweste.

Giyan zagehê wêjeyê ye û wêje jî afirandin e û tenê di wêjeyê de bersîv ji bo wan pirsyaran peyde dibin (6).

Giyan nepenî ye. Belê peyam û zimanê xwe heye û ji biyavê wêjeyê hemûyê ew ziman tenê di helbestê de heye. Tenê helbest dikare mirovî rûberî yê nepenî bike, bi merca (şertê) ku mirov wê peyamê û wî zimanî têbigihe. Giyan dergehê gerdûnê ye û helbest kilîta wî dergehî ye.

Ji kevn de, ji serdemê Loncînos û heya ku digihe Dostoyevskî û Sarter, Camu, di wêje û felsefeyê de bi analîz diselmînin ku giyan wargehê afirandinê ye û ne sewda her wek hindê kesayetiyên Epîstemolojî dihizirînin.

Bizav an livîn zimanê cestê mirovî ye.

Nalîn û amaje zimanê derûna mirovî ye.

Lê, zimanê ruhê mirovî?

Zimanê ruhê ne tenê wateyî ye û ne jî tenê dîmenî ye. Belê belkî wateyî-dîmenî ye, lewra berfireh û bêdad e, di heman demê de zehmet û aloz e:

Ziman = wate : (Pûkandin), (Buhujandin), (Bejna Azad zirav e).

Ziman = dîmen : (Lûlav), (Fîrîn), (Bejna agir bilind e).

Di zimanî de hêza nepeniya ruh û rewaniya hizrê diyar dibe û ew ziman bi wate û dîmenî di helbestê de rasteqîniya saxletê diçespîne.

Ez bawer dikim ku sêgoşeya mikum: giyan, hizr û ziman, pêkhateyê serekî ye di helbesta Şêx Ehmedê Huseynî de:

"Min nedizani ku ez dê ew qas bêriya goristana bajêr bikim. Eger li roja pêncşemê tu çûyî serdana dayika min, kêstekên li dora gorê biguvêşe da ku nalîna min bê vejandin. Dema ku tu ji goristanê vedigerî, tu rêya xwe bi kolana me bixe: li ser dergeha hewşê, çavên min daleqandî ne, wan biramûse da ku ziwa nebin.. tika dikim."

Cest di goristanê de dadirize. Belê ruh dût e û bêriyê dike. Ew kîlîka demê, serdanê reqîb e û ew kêstek şahid in li ser amadebûna ruhê ji bo gora dayikê.

Ma ne tenê ruh û derûn dinalîne?

Her du çavên kê ne li ser dergehê hewşê daleqandî ?

Ew (kesek) zindî ye wiha dipeyive, ne di bin axê de ye û tenê ruh zindî û azad e.

Gelek pîrs û niyar hene ku dikarin wek alav ji bo zimanî bi kar bên wek: Nivîsar, peyam, gotar, pexşan, tenanet roman jî belê helbest na, jî ber ku helbest cuda ye û gerek e ziman bi xwe alavek be ji alavên helbestê, jî ber ku helbest wek derbirîn, ciwanî û hizr, zimanekî serbixwe ye û dikare her zimanekî din di nav xwe de bibuhjîne.

Helbest ne tenê zimanê giyan û xeyalgehê ye. Belê destpêk e jî her wek Buckhîtîn amajeyê ji bo dike *"Ziman ji amajeyan pêk tê, amaje nimayîş e û nimayîş wêneyan dide. Di navbera du kesan de, ew wêne hizrekê, ramanekê, pîrsyarekê pêk tînin...!"*

Lewra, pêwîst e ku helbestkar xwedî be û berî her tiştî xwedî ziman be. Gereke berpirsariyên xwe bipejrîne û bêtêmasî. Belê ya jî hemûyan girîngtir gereke azad be tenanet gava ku dinivîse jî.

Ziman alavekî sereke ye ji jî bo encamdana her karekê, nexasime karê wêjeyî.

Pîrsyar : kîjan in karînen wî zimanî?

Ziman bi xwe nikare gelekê bike eger hat û berawirdî helbestê bikin. Belê helbest bi wî zimanî dikare gelekê bike û her wek Heeîddeger dibêje: "Helbest dikare çendîn welatên azad ava bike, çendîn yarên bedew peyde bike, dikare jiyanekê nû dest pê bike..." Ango, hêza helbestê di wir de ye, belê hêza zimên di helbestê de ye.

Binêre Şêx Ehmedê Huseynî çawann vê yekê teqez dike:

"Toreya ku min ji henaseya berbangê ji bo masiyên çavên te, amade kiribû li masiyên mirî digeriya bêsiwar, wek hespê xalê min, li min vedigeriya."

An jî:

*"êş
dê bixwaze ey pinpinîka min:
rengê gulê?
Bêhna gulê?
Dengê gulê?
Têhna gulê?
Na.. na, keskesora kulê!"*

Helbesta Şêxê Huseynî berev felsefeyê naçe, lewra ku li çi cih û zimanan ranaweste, çimkî felsefe belge û beyankan dixwaze û li ser lojîkê xwe ava dike û tenê ji bo îro tê nivîsandin. Belê helbest na, her wiha helbesta Şêxê Huseynî.

Dostoyevskî dibêje: "Ruhê me nesax e...!"

Şêxê Huseynî berî me hest bi wê nesaxiyê dike, lewra gotina wî bi zimanê kurdî dubare dike. Belê mirovî bêhtir diêşîne: ruhê me şikestî ye!

Nesaxî cuda ye ji şikestinê, çimkî nesaxî dikare çareser bibe. Belê şikestin ne li her demê dicebire.

Helbesta Şêxê Huseynî bi asoyên berîn, xeyalgeha bêendaz, zimanê jandar, hestên pakîzan û pîrsyarên mereqdar dikare bandorê li ser astê hizra xwandevanî bike û her ev e daxwaz ji karê wêjeyî yê berdâr her wek Plehanov dibêje.

Dawî ku wî nasnameya xwe wek helbestkar çespondî, niha bûye derbirîner ji bo gewherê hebûnê û dikare nasnameyê bide yên din jî.

Dikare deng û rengî bide her tiştî, dar, ber, av, ba û agirî. Hêza wî di xeyal û zimanî de ye: dikare bi zimanekî rewan û asan der-birînên herî zehmet peyde bike û her wisan zimanê wergera ruh jî, ku bi saya wî zimanî astê yê penî û yê nepenî bide xuyakirin û wek silava rêbarekê hindek pirsyarên arhîner araste bike.

Mijara yê penî û yê nepenî di jiyane de gelek girîng e ji bo helbestkarî, bi taybetî yê nepenî û ev ji bo Şêxê Huseynî jî wiha girîng e dema ku dibêje:

"Xwe amade bike, rêkên nevegerê bi şara xwe ya mûsilî bixemlîne

û navên me li ser eniya berbangê bi ximava oxirê binivîse

Xwe bilorîne û xwe biavêje bîra şevistanê da ku Girê Mozan pêşwaziya darbesta baranê bike

Xwe amade bike, da nîsanokên gerdena te siya ramûsana min derbas bikin

xwe amade bike,

da babelîsokên serberdayî yên ferhenga te,

bêhnçikandina min ji kêferata mirinê nas bikin."

Rabînî (pêşbînî) pir zehmet e ji bo mirovê asan belê ji bo mirovê helbestkar pêgirî û berpirsariyê ye ji ber ku ast û nasname û rastiya wî diselmîne. Heya ku bikare bibe rabîner, pêwîst e ku gumandar û azad be. Lewma ku Şêxê Huseynî jî bi guman û azadî hewl dide kêferata mirinê ji bêhnçikandinê rabibîne.

Gelek helbestkar hene ku behsa pirs û niyarên cuda dikin ji bo nimûne: Ruh, jiyana, mirin, evîn, agir, hebûn û nebûn. Her wiha welat û azadî û nasname, lê mixabin tenê li ser hebûn an nebûna wan pirs û mijaran disekinin. Belê kêma helbestkar hene ku li ser wate û pêkhate û gewherî bisekinin her wek Şêxê Huseynî katê ku behsa dûriyê dike:

"Biyani av e

axîna te derya ye

kolana şerpeze

ez ê vê carê xwe biavêjim sîtava te

mîna lehiya kor.

nehişî,

wek leşkerê bêgor.. "

An jî wexta ku behsa Amûdê dike:

"Her sibeh

me gulên te yên zikmakî

me rêkên evînê û dilpakî

bi xunava bêrîkirinê diparast..

dergehên bi navnîşanên şînê

di axîna te de

peşkên barana sersar û dîn,

û me xewrevîn bi ebrûya hêviya stewr dialast..

em çûn xwê.. dara tûyê di tozê de ma

em di sînga te de ji girî lal bûn

lê tu mayî zengil

û temaşevana dilrast..!"

Li gor gotina Homerosî derbarey pirsyar û bersîvan di demên fireh û tengav de, ka em rewşa xwe, dorhêlê xwe bihelsengînin da bizanibin ka tengavî yan firehî ye. Kêmbûna arastekirina pirsyaran di karên wêjeyî de, nayê wê wateyê ku firehî ye. Belê bi berovajî, ancax tengavî ye û kesê ku bixwaze rûberî pirsyaran bibe, bila helbesta Kurdî ya nûjen bixwîne û wek mînak helbesta Şêxê Ehmedê Huseynî.

Belê, pêwîst nake li bersîvan bigere çimkî bersîv tenê li firehiyan peyde dibin.

Silav li helbesta kurdî, li sercem helbestkarên Kurd, li şêxê helbestkarên Kurd Ehmedê Huseynî. Silav li ruhê wî ya şikestî di derengmayîna me de, di buhujîna me de, di lixwegerîna me de. Silav li zimanê wî yê birîndar ji birîna mirovahiyê di nav me de. Silav li hizra wî ya azad, silav li wî yê hestiyar û evîndar.

Jêder :

A- Dîwan (Berhemên giştî yên Şêx Ehmedê Huseynî)

B- Felsefe û Modêrnîzm - Hegel: Rêbîn.I.Resûl

C- Daxistana Min - Resûl Hemzetov

(1) Spînoza.

(2) Homeros.

(3) Hegel.

(4) R. Hemzetov ji pirtûka Daxistana Min.

(5) Felsefe û Modêrnîzm. Rêbîn. I. Resûl

(6) Milan Kundera.

Nîşe: ev nivîs di malpera 'www.silevani.com'ê de hatiye weşandin û ji bo ser kaxiz hatiye hinartin.

Ehmedo Ronî

(di ser Diyarbekirê re ji Ehmed Huseynî re nameyek)

Ferîd Xan

1.
(...)
Çirayên şikestî yên kuçe û kolanan
Perdeyên Qalind
û giraniya taristanê
Hevalên bêcigare
Pirtûkên qedexe
Evîna bi dizî
Şevbihurkên bêser û ber
Mûzik û helbest û keçên dudil
Û tavsorka êvarê
Ya ku bi xatirxwestinê dipertî..
Helbestvano!
“Berîya ku şîniyên te bibuhurin”
Berîya ku
Nav
û gav
û tav
û hevoka reşgirêdanê
di hişê te de bidirin
Ne
xem
e,
Tu ji mêj ve
Min dinasî
Tu dizanî dê çi bibe,
eger bête der ji mehrebaniya avê, masî?
(...)

Ehmed Huseynî

2.

Ez te di hemû kolanan de lezmeşiyayî
dibînim. Mîna tîrek ji kevanek êşiyayî
pekiyabe, wisa lezgîn, wisa li paş xwe
nemêz bi kû ve diçî?
Êvar li Stockholm e*, Bazyar li London e*,
zaroktiya te li Amûdê ye, tu wisa ji wan
dûr, ji zarokên Amedê dûr, ji mindalên
Silêmanî dûr, li kolanên bajarê Wuppertal
kûr û kûr li çi digerî?
Peyvên te winda bûne... hespên te filitî
ne... solên te ji lingên te reviya ne...

50 sal in tûrê te yê ku di rêya helbesteke
birîndar de qulbûyî, li van kolanan girîna
nijadeke ji dilqê xwe derketî direşîne.
Serxweşên Roavayî bi tewişînên sersar li dû
te pê li girînên nijada te dikin û derbasî
nefreta te dibin. Cîhana zewzek, cinên
derwariyê û Kurdên bi şûr hatine kerîkirin
mîna qamçiyek li newqa te dikevin û tu bi
êşa vê qamçiyê sermest û dîn xwe li
kolanan dixînî.

Zû dimeşî.

Hemû hevalên te li welatên ji te dûr wekî
kewan hatine kemînkirin, tîkiliyên we û
ava bîranînên we ji ser hev hatine birîn. Tu
bi wê axa xwe ya ku av li ser hatiye birîn û
bi wan bîranînên ku di hembêza te de
hatine ziwakirin, xwe li baranê, xwe li
barana bin çirayên kolanên derwariyê
dixînî. Tu masiyên xwe yên ku ji mehre-
baniya ava xwe qetiyane bi baranê, bi
bîrayê û bi rondikên zilamek zargiryayî av
didî.

Piştî hêrs dibî tu.

Dema Charles Baudelaire li Bruksel e, ji ber
ku kêmbelçîkî diçin semînereke wî, heta
dawiya jiyana xwe ew ji belçîkiyan nefret
dike.

De ka ji min re bibêje; Eger em jî niha wekî
Baudelaire xwe dîn bikin, divê em heta
dawiya jiyana xwe ji çend partî û dezgehên
kurd û ji çend neteweyên Ewropayê nefret
bikin?

3.

Ez te di rûniştinên şevan de serçûyî û xwêdandayî dibînim. Tu mîna zarxweşek diaxivî, vedixwî û serê xwe bi şûşeyên meyxaneyan dişikînî. Henekan dikî, nukteyên amûdiyan dibêjî û min, hevalê xwe Yûnis û Xelat Ehmed didî kenandin. Elmanên li derdora me bi rûyekî hesûdbar li me mêze dikan. Ji wan qey ku hîç êşa me nîn e, ji wan qey ku em mirovên herî kêfxweş ên vê cîhanê ne. Lê qey nizanin ku mirovên êsgiran kenîna herî xweşik dikan.

Ew nikarin wekî me bikenin. Elmanan piştî Şerê Cîhanê yê duyemîn kenîna xwe winda kirine. Pêkenokan ji zimanê wan baz daye. Şermezariya bi milyonan Cihûyên ku di odayên Gazê de hatine şewitandin li rûyê elmanan mîrateyek hiştiye; Rûsarî. Rûsariya gelên German dijminê me helbestkaran e. Dilê me ji nîgaşê sar dike. Cemed û pûsê pêşkêşî çavên me dike. Bîst û çar saet xeribîya me û bîst û çar saet biyanîbûna me di bîra me de dihele. Rû ji me re divên Ehmedo Ronî... rûyên ku em lê mêze kin û nîgaşan jê bibarînin. Rû ji te re divên Ehmedo Ronî... rûyên ku tu ji wan gul biçirpînî û pêşkêşî helbesta xwe bikî.

Lê niha ez nîvek temenê te li van welatên qeşayê û li ber deriyê van rûyên qeşayî dibînim. Ez te di çemê vexwarinê de, ez te di êşa kenîna de û ez te di westandina bêrîkirinê de dibînim.

Wekî "Bajar"ê Kafavis, Amûda te jî bi dû te ket û li çendîn bajarê Ewrûpayê kolan bi kolan westiya, mal bi mal weşiya û ferd bi ferd winda bû. Amûda ku li dû te şewitî û zarokên xwe û kolanên xwe yek bi yek li Ewropa winda kir, te bê sermiyan hişt, te bêbîranîn hişt û te bîngaş hişt...

Gelo ji ber vê sedemê te pênûs rawestand? Gelo ji ber ku te nikaribû bê sedem li rûyê gelên German mêze bikî te pênûs sekinand... Û gelo ji ber ku te nikaribû bêsedem bi şev ji jinan maçek bixwazî te pênûs şikand?

Ji bo van pirsan bersîvan ji te naxwazim Ehmedo Ronî... Hinek pirs bînamûs in; bersîvên wan mîna qehpikên xwînşîrîn carê di deriyek re derdikevin!

Ez te di "Şevbihurkên bêser û ber/Mûzîk û helbest û keçên dudil/û tavsorka êvarê/ya ku bi xatirxwestinê diperitî..." de dibînim. Tu sixêfan dikî.

De ka ji min, ji Yûnis û ji Xelatê re bibêje; Sixêfên helbestkarê kîjan neteweyê ji helbestên wî zêdetir bûne?

4.

Ez te ji bo mirovê bi peyvê ducan reştûyek dihejmêrim.

Ez te di zewaca du gotinên lihevhatî de berbûkek dihejmêrim

Ez te di kurmancî de çelekek peyvdan dihejmêrim

Ez te di bin baranê de, di kolanên çendîn bajarên Ewrûpayê de hinekî Amûda Şewitî, hinekî Qamişloka Xwînê, hinekî Mehabada Hilweşiyayî û hinekî jî Ameda Darbestkirî dihejmêrim.

Û

Ez te masiyekî ji mehrebaniya ava xwe hatiye mişextkirin dihejmêrim, Ehmedo Ronî...

14.Tebax 2005/ Wuppertal

*Êvar û Bazyar zarokên Ehmed Huseynî ne.

Ehmedê Huseynî û beşdariya zimanê kurdî di mîratgiriya mirovatiyê de

Xelat Ehmed

Gelek dem û çerxên dijwar bi ser neteweya kurd de hatine, neteweya kurd a ku ji alî biyaniyan ve him dîl û him jî dagîrkirî bû û hê jî wisan berdewam dike..

Em di vê gotarê de, xwe nêzî mijara dagîkirinê nakin, ne jî em ê der barê serencamên wêranker û malkambax û bandorên wê li dîrok û jiyana neteweya kurd bipeyivin. Lê dîsa jî pêwist e em ji bîr nekin ku ziman û toreya kurdî ya nivîskî hetanî radeyeke balkêş bûye bi qurbana dagîrkirina neteweya kurd. Kesên ku di dîroka me de beşdarî avakirina wê toreyê bûne, li ser tiliyan têne jimartin. Bi kurtî, mercên dagîrkirina berdewam û hewldanên jîholêrakirina nas-nameya kurdî, nehiştine ku çanda me ya nivîskî geş bibe.

Kesên ku beşdarî avakirina toreya me ya nivîskî bûne, digel ku hindik in jî, lê dîsa jî her yek ji wan xwedan taybetmendiyeke e. Her yekî ji wan kesan bi awayekî hebûna xwe û hebûna zimanê xwe parastiye û bi dijwarî li pêşberî zordar û dagîrkeran rawestiyaye, da ku xwe û rengê zimanê xwe, bêhna çanda xwe di dîrokê de bi cih bike.

Dema em behsa toreyê dikin, navê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqiyê Teyran, Mewlewî, Nalî, Mehwî, Koyî û Goran tên gotin.

Bi derbasbûna demê re, helbestkarine din tevî karwanê derbirînê dibin, li ser avahiya wan damarên ziman ên ku ji hev hatine birîn, diçespînin û geş dikin, gewdeyê zimên zindî dihêlin û zimanê neteweyê ji mirinê rizgar dikin, lewra em ê bibêjin Cegerxwîn, em dibêjin Şêrko Bêkes û va em a niha jî dibêjin Ehmedê Huseynî.

Ez ê di vê gotarê de, aliyekî ji ezmûneya wî binirxînim. Ehmedê Huseynî, li Rojavayê Kurdistanê, li Amûdê sala 1955ê ji dayik bû. Heta niha heft dîwan weşandine, ew jî ev in:

1. Mistek ji şîna bêcir.
2. Bi xewna we penûsê dilorînim.
3. Rono û sirûdên bêrîkirinê.
4. Bazbend.
5. Kewname.
6. Nimêjgeha xewnê
7. Bajarê dirinde.

Bingeşa van berhemên bi giştî rexên mirovane yên pîrsa kurd û şîngirî ye. Bêguman e ku di vê gotarê de ez ê neşem der barê ezmûneya Ehmedê Huseynî ya helbestî û hemû aliyên afirandina wî bipeyivim, a baştir ew e ku ji diwana wî ya bi navê "Bi xewna we penûsê dilorînim" dest pê bikim. Di baweriya min de, ew berhem ne bi tenê xala guhertina pêvajoya nivîsandina Ehmedê Huseynî ye, lê belê guherîna pêvajoya helbesta kurdî bi giştî ye, jixwe mebesta min a kurmancî ye. Çimkî di vê berhemê de nişanî seretayî hene mirov agahdar dikin ku êdî cîhaneke helbestî ya cihêreng dest bi jidayikbûnê dike. Ehmed jî di vê çarçeweyê de hetanî kurtedemekê bêhna xwe fireh dike, da ku bêhtir bipije û biryara xwe bide ku dest bi şewazeke



ji nivîsandina cihêwaz bike, afirandina vê cihêwaziyê jî di "Rono û Sirûdên bêrikirinê" de destnîşan dibe.

"Rono û Sirûdên bêrikirinê" wek pexşan hatiye nivîsandin, şêwaza wê jî şêwaza nameyan û bîranînan e, lê bêyî ku ji helbestê bêpar be. Reng e nîşanên seretayî yên destpêka jidayikbûna wê cihana ku me li jor behs kir, di helbesta awazên Rono ji diwana bi xewna we penûsê dilorînîm bi gewde dibe. Awaz di vê helbestê de dibin "Sirûdên bêrikirinê", di diwana sêyemîn de.

Di heman berhemê de, berevajî berhema yekemîn, em ber bi pexşanê ve çûyîna helbestvên dibinin, bi taybetî di helbesta Newroz û Serbitackirina Qublenameya Giyan de.

Wa diyar e ku di dema nivîsandina berhema yekê de, Ehmed bi rastî dixwest ji helbesta Cegerxwînî ber bi helbesta serbest ve biçe; helbesta serbest ne bi tenê ya ji terazî û beşavendê rizgarkirî, lê belê ya ku di mijarên xwe de, di awayê danûstendina bi mijaran re ji rizgarbûyî.

Helbesteke wisan e ku xwe dispêre avahiya xwe ya derûnî, da ku nîrxên helbestê bêtî palpiştên derveyî bi dest xîne.

Digel ku berhem bi giştî xwe dispêre sistema hemahengî û hemwateyan wekî sistemeke dengdêr ku digel çêja kurdan digunce, çêja ku bi beşavendê û hemwateyan perwerde bûye; ne bi tenê di helbesta naskirî ya wê demê de. Lê belê di dastan û efsane û serpehatiyên ku hetanî demeke nêzîk mîratgiriya me ya çandî ya herî dewlemend dadimezirandin ku, çêja me ya wêjeyî bi wan perwerde bû.

Ger berhema yekemîn hewldana pêşîn be û ji bo xwerizgarkirina ji realîteya wêjeya naskirî ya wê demê gavavêtineke diwartir be û ber bi cîhaneke helbestî ya cihêreng ve çûyîn be, cîhaneke cihêreng di mijarên xwe de, di şêwazên xwe de, di dayîn û pêşkêşkirinên xwe de, em dibînin ku Ehmed di berhema xwe ya duyemîn de hêdî hêdî ezmûneya xwe ya di helbesta nûjen de diçesipîne û kûrtir dike. Ger em li vir vegehin helbesta Newroz û serbitackirina Qublenameya Giyan, em ê bibînin ku ne bi tenê wek pexşan hatiye nivîsandin, lê belê di şêwaza avakirina xwe de jî nû ye. Helbestkar wê helbestê wek sê dîmenan pêşkêş dike, sê dîmenên ku bi jiyane ve girêdayî ne:

1. Xwelibakirina êgir / Ba, Agir/
2. Şahnaziya avê / Av /
3. Bûyerên rûpelên axê / Ax /

Ev bare bi xwe di helbesta kurdî ya nivîskî de bareyeke nû ye. Gelo em dikarin li vir bibêjin ku jiyana mişextiyê û serencamên wê yên derûnî wek namoyî û bêtîkirinê rola xwe listine, da ku helbestvên ber bi vê şêwaza taybet ve rakişîne. Nemaze dema ku em bibînin ku navê pirtûkê bi xwe bi "Bêrîkirinê" ve girêdayî ye?

Veguhestin û Koçkirina ji cîhaneke kurdewariyane ku ji hemû rexên xwe ve

dorpêçkirî, dagirkirî û bînpêkirî ye, ango koçberiya ji Rojavayê Welêt, rojavayê çewisandî, ber bi rojhilatê bajarvanî û cihêrengiyê ve, cihêrengiya di forman û naverokan de, Ehmedê Huseynî ber bi rewşeke derûnî û wijdanî ya cihêwaz de dehf didin; ev rewşa nû ji bo nivîsandinê pêdiviyî alav û şêwazine nû ne jî. Ango vê jiyana nû, vê bareya nû, vê hebûna nû êdî şêwaza xwe ya nû di warê nivîsandina helbestê de peyde kir. Helbestkar jî di vî warî de bi cegerdarî berê xwe dide vê nivîsandina ku berî wî di helbesta kurdî de nenaskirî bû.

Ehmedê Huseynî yê ku hemû qonaxên xwendina xwe û hemû zanîna xwe der barê wêjeyê û jiyane bi zimanê erebî pêk anîne, ne bi tenê çimkî zimanê kurdî qedexê bû, lê belê ji ber lawaziya pirtûkxaneya kurdî jî li hemberî ya erebî ku bi ser hemû babetan ve vekirî ye, mîna edebiyat û felsefe û zanistiyên din jî.../ her ku çendîn helbestkar di civateke kurdewarî de jî perwerde bûbe jî, dîsa em bandora edebiyata erebî dibînin. Ez bi xwe wek helbestkareke kurd ku bi erebî dinivîsînim, pir bi hêsanî dikarim li pey wî tayê zirav herim bi taybetî di deqên wî yên pexşanî de. Lê di baweriya min de, ev yek bi xwe helbesta wî dewlemendtir dike û alîkariya edebiyata kurdî dike ku ji qonaxekê ber bi yeke din ve here û hinekî zûtir geş bibe. Li vir em hêz û westana Ehmedê Huseynî hest dikin ku çawan hewl dide û têdikoşe ku wê bandora erebî di kurdî de winda bike û ji bo berjewendiya helbesta kurdî terxan bike.

Kesên ku helbestên Ehmedê Huseynî dixwînin di cih de êşa kûr û şîngiriya wî ya bêhempa dijîn. Şîngiriya wî ya watedar a ku rastiya jiyana û mirinê dizane. Şîngiriya ku gelek caran nahêle bala xwendevanan bikişe ser zimanê wî yê bejinbilind û spehî û narîn, zimanê ku Ehmedê Huseynî wî bi hestdariya giyanê kurd nîgar dike. Zimanê wî yê ku dê ji bo wêjeya kurdî xelateke mezin be, zimanekî rewan, ku di nermahiya xwe de nîgaş û xeyal û hest û nestên me hembêz dike, ku laş û giyanê xwe bi alîkariya hunera helbestvên ji kevneşopiyê rizgar kirine.

Di "Rono û Sirûdên Bêrîkirinê" de, ji helbesta pêşîn ve, helbestkar mirovan agahdar dike ku

helbesteke ne asa û ne normal dixwîn, em dest bi vedîrîna wêneyên cihêwaz dikin, em dest bi vedîtina cîhaneke nûjen ji xeyalan û derbirînan û afirandinan dikin:

"yara min
ez û tu. Serpêhatî û du çûkên bi xunava
şîniyên giranbuha şilbûyî. Hêlîna çavên te
axîna min bû. Bi xwelibakirna porê te re
rûpelên serpêhatiyê diweşîyan. Sira bayê sibê
û tovên bêrikirîna bi hev şa dibûn. tu di nav
pença xewna min de zuha dibûyî. pirsên min
ji sînga te wek çavkanyan dipijqîn "

Ev helbest ji pênc beşan pêk tê, her pênc beş ji hev ne cihê ne. Bi taybetî dema ku em dibînin ku helbestkar hewl dide ku her beşekî bi "û" yê dest pê bike. Her beşeke ji helbesta xwe bi pexşanê dest pê dike û bi helbestê bi dawî dike. Hin ji me dikarin bibêjin ger em hevokên helbestî di xêzekê de li pey hev deynin dê hemû beş wek pexşanê diyar bibe. Bi rêjeyî wî tayê zirav ê ku cihêbûnê dixê navbera helbestê û pexşanê mesele rast dixuye, lê em dikarin yekîtiya ramanê bibînin; yekîtiya ramanê ya ku pêwistî beşekî pexşanî ye, da bişê (bikaribe) naveroka wêneyê ji bo xwîner (xwendevan) veguhêze. Lê belê di hevoka helbestî de, ramanên piralî û kurtewêne tên liqelemdan. Li vir helbestkarî ji pexşanê baştir bi rola xwe radibe, çimkî pexşan bi xwe di çarçoveya hem-bêzkirîna ramanan û wêneyên aloz de hêzdar-tir e. Di dema ku Ehmedê Huseynî ev şêwaz di nivîsandina helbestê de bi kar anî, pêwist bû tê biramiya ku ferhengê amade bike; ferhengê ku bi pêdiviyên vê şêwaza nivîsandinê re bigunciya. Lewra car caran hindek wişeyên (peyvên) zaravayê soranî bi kar tîne, ne bi tenê ji bo ku helbesta xwe ya kurmançî ya ku hewcedarî hin wişeyan e tekûztir bike, lê belê da ku wê avahiya ji dangan, dengên ku di nivîsê de guncaw in berdewam bike û gelek caran jî hevo-ka xwe dirêjtir bike. Jixwe hêzdarî û karîna derûnî di van kêlikan de nayên veşartin; hêz û karîna ku helbestkar van hevokan ava bike bêtir ku derbasî tevlihevî û sistahiya derbirîna bibe. Li vir em ji Ehmed didexisin ku çawan dikare tîrahiya deq, hêzdarî û hevgirtina deq û narîniya wateyan bipêrêze.

Digel ku helbestkar xwe diavêje zaravayê soranî jî, em dibînin ku armancên wî yên helbestî her û her hewcedarî peyv û wişeyan in, peyvên ku bikaribin helbesta wî ragihînin û hêjayî ragi-handina helbesta wî bin. Lewra ji bilî riya ku peyvyan biafirîne û gencîneyên giyanî yên zimanê kurdî zeft bike, bi hişyariyeke jixwe-bawer di warê rêzimanê de Ehmed wan peyvyan jindar dike, vedijîne, teze dike. Hestek wisan li ba me çêdibe ku ew peyv her dem hebûn, lê bi tenê wî ew ji bêdengiyê rizgar kirine, da ku ji nû ve wan bi bîra me bîne. Tiştê ku Ehmed di wî warî de kiriye ew e ku giyanekî berfirehtir û hêzeke bêsînor dan zimanê kurdî; ziwayî û hişkahiya zimanê me yê wêjeyî şikandin. Zimanê me yê ku bi hindek wişeyan ji dema Cegerxwîn ve dihat nasîn û dorpêçkirin. Her wisan, pêwist e em şêwaza bikaranîna kurman-ciyê û awayên wî yên avakirina wêneyên spehî ji bîr nekin. Zimanê ku diherike û wêneyên balkêş û surdar, di serencamê de, êşa ku em ji herikîna hestan werdigirin siviktir dike.

Dadmendiya pêwist e were gotin ew e ku tiştê ku Selîm Berekat di erebî de kiriye Ehmedê Huseynî heman tişt di kurdî de kiriye. Bi tenê yek cudahî di navbera wan de heye, cudahî jî ev e; zimanê erebî amade û kamil bû û Selîm Berekat ji nû ve hewl da ku wî zimanî di ferhen-gan de bibîne û bi şêwazeke teze bi kar bîne. Lê Ehmedê Huseynî peyvên zimanê xwe ji jiyana rojane û ji mîratgiriya gelêrî berhev dike û ji nû ve wan wişe û peyvyan perwerde dike, dini-jînîne, tekûz dike û diyarî zimanê wêje û afirandina edebî dike. Gelek caran hêza peyama wî ya helbestî wisan dike ku ferhenga xwe ya taybet-mend di warê ziman de pêşkêş bike.

Em ji bîr nekin ku gelek caran helbestên xwe bi hin parçehelbestên helbestkarine din pîk dike, helbestkarên wekî G.Anrîk, N.Kazanzakî, M.Rilke, V.Kox, I.Yojîv, Feqiyê Teyran û gelek caran jî bi hin nimûneyên ji folklorê kurdî wan dixemilîne. Li vir Ehmed me agahdar dike ku mîratgiriya mirovatiyê tiştêkî hevbeş e û me agahdarî wê yekê dike ku hêza zimanê kurdî heye da beşdarî wê mîratê bibe; zimanê kurdî yê ku dê Ehmedê Huseynî her û her nimûneyek ji nimûneyên nûjenkirina wê be.

Helbest, ku ji hisûtina pirsan û wêdetir diçe

Hoşeng Broka

Helbest, helbesta ku ji wê rê diçe giriyê navbera her du destên Huseynî; ku ji wir rê diçe “sêva navê yara wî”, “êvarên wî yên ji titûnê”, “paytextên wî yên ji xweliyê”, bajarên wî yên ji wexta “dirindeyî” û serhişkiyê, “bejnên yarên wî yên ji êşê” û goristanên wî yên ji bendemanê, aliyê wexta pirsê, berî pirsê û piştî pirsê ye, ku ji “Amûdê” heta bi “Amûdê, ji “Rono” heta bi “Rono”, ji “kesera navê wî” heta bi “kesera navê wî” û ji mirinê heta bi mirinê, diçe “pêkenîna dijar a ku jê re jiyan dibêjin”(R.9).

Helbest, helbesta ku ji wir rê diçe wexta navê Huseynî, helbesta wexta êşa kamil û tekûz e, ku ji tozê heta bi tozê, diçe bêrikirinê; ji dara hinarê heta bi dara hinarê, diçe kesera “qehwehiyê” zaroktiyê; ji şewatê heta bi şewatê diçe, “Amûdekê” ji çûyîna zarokan; ji “goristana bajêr” heta bi “goristana bajêr”, diçe “roja pêncşemê” ji berfê heta bi berfê, diçe “silavgeha mirinê”; û ji Stokholma berfa xerîb heta bi “xerîbiya Stokholmê” û “xerîbiya berfê”, diçe windabûnê: diçe kêlîkên winda, gavên winda, destên winda, mirina winda, goristanên winda, hicrikên winda, esmanên winda, Xwedayên winda, gavên pêxemberên winda; pirtûkên winda û peyvên winda.

Lewra Huseynî bi pêşkêşkirina “berhemên xwe yên giştî” re, hewl dide ku xwînerên ji wexta navê xwe, ji xwendinê heta bi xwendinê, pêşkêşî destên ji qernefelan ku

haha bi babezkê diçin “tavsorka” darbesta wî, ya zû, bike: darbesta ku Huseynî bi xwe jî, hîn jê bêhay e, aya ew ê ji Stokholmê, ji berfê û ji okyanusên sar û wêdetir biçe, yan na?(R.9).

Helbest; helbesta ku Huseynî navê xwe yê ji “kesera qehwehiyê” li ber asîtankên wê vedaye asmanek “ji şîna bêcir”, ji bersivê û wêdetir diçe pirsê: diçe wexta pirsê, berî pirsê û piştî pirsê, ku firehtirîn aliyê wê ye. Lewra Helbest li pey şehdebûna Huseynî, wek pirseke mezin ji bo “bersivên mezin ên ku nayên”, diçe kesera navê wî. Lewra “helbesta wî ber bi pirsan ve diçe, lê li nik wan ranaweste”(R.9).

Helbesta Huseynî wiha ku diçe hisûtina (sûtin) pirsan, dibe helbesta bazdana esih a li dû ebeda pirsê:

Pirsa jidayîkbûnê, ku ji “paytextên tozê” û wêdetir diçû; pirsa “pêkenîna dijar a ku jê re jiyan dibêjin”; pirsa axê, avê, agir û bayê*, ku ji têkçûnê û wêdetir diçûn; pirsa sînoran, ku ji “xwîna kewan” û wêdetir diçûn; pirsa kewan, ku ji qeqqebê heta bi qeqqebê, ji kurdan diçûn kurdan; pirsa êşê, ku ji “Amûdê” diçû “Amûdê”; pirsa şewatê ku ji zarokan û sînemeyan diçû sînemeyan û zarokan; pirsa yarê û bejna wê, ku ji “êvarên ji titûnê” heta bi “êvarên ji titûnê” diçû “stêrka karwanan”; pirsa navê yarê, yê ku Huseynî pê “çûk hînî hêlîna dilê xwe dikirin”(R.161); pirsa darbesta zû, ya ku diyare wê ji berfê biçe berfê(R.9)....htd. Huseynî, ku bû yê wexta çînîna peyvê, hewl da ku bi “zimanê dayika xwe” biçe werzên çînînê: çînîna girî, êşê û şewatê; çînîna kewan, ku “Girê Şermola dinîqutî dilên wan”(R.334); çînîna tîlên derehî “sînorên serserî”(R.157) û “paytextên pir, ku wexta wan bajarên jidayikbûna (Huseyniyan) li ber lingan diçûn”(R.346) ; çînîna “stêrkên karwanan”(R.158), “gulên berbero, yên ku bi pêjna “Rono”, dilşad dibûn”(R.112), kulîlkên hinaran û hîroyê ji

“bejna yarê”; çinîna “hechecîkên” xatirxwestinê, “mizgînêrên” bendemanê(R.101) û “pezkoviyên” ji bêrikirina her du dilên “Siyamend û Xecê”(R.92);çinîna “Tariyê” ku di bendemana “Qazî” de, “di hilma şevê de tîr-tir dibû”(R.83); çinîna stranan, ku wexta wan û wexta “tembûra ji hêşiran”, “tiliyên Mihemed Şêxo (yê ku bejna wî ji gula berbero û wêdetir diçû), di berîka berbangê de diqerimîn”(R.33); çinîna şevê, ku Huseynî “hembêza yara xwe ya ji gulgeniman, bi rondikan hişyar dikir”(R.453); çinîna berfê, ku “çavên wê li ser devê riya (Sîpanê Huseynî) diqerimîn”(R.141) û darbest di bendemanê de, hêşin dibûn; çinîna poşmaniyê, ku ber bi “rexên berfê” û “rexên gorisatanê”(R.414) ve dişemitî; çinîna “serhişkiya qonaxê”(R.161); çinîna “êvarên ji mijê”(R.141) ku diçûn “tûtînê” û çinîna heyvê, ku “nedibû gustîlka ten-hatîyê”(R.337).

Wiha Huseynî bi zimanê dayika xwe, çû wexta giryanê, da ku pirsan, ji helbestê heta bi helbestê, aşt bike, her wiha hewl da ku bi heman zimanê kêlikên azadiya bi kurdî, yên ku “ji milyonên salan ve bazdayî, zeft bike”(R.10).

Huseynî wiha bi kurdî, hewl da xwe: ku pê ji êşa navê “Rono”; ji “Xwedayê çîyan, yê dil ji berfê”(R.33); ji “Şêxê Sen`an, ku piçekî li ber dergê mezî yê mizgefta mezî, radiwestiya”(R.401); ji “Bûka êgir”; ji “Ebdilbasit, ku Huseynî bêriya serhişkî û bêcîriya wî dikir”(R.169); ji “kew, ku tîrsa wî ber bi kenarên goristanê ve diherikî, (Huseynî) hildiperikî barana destê sibehê”(R.321); ji “kew, yê ku eger hat û çar sînorên deyûz xwîna xwe xistin stûyê zemîna wî”(R.328); ji “Kew, ku wekî çawan toz dihat ew (jî) dihat (û) bajarê (Huseynîyan) li ser milên wî diçurîsî”(R.369); ji “Roka ber êvarê, ku bi dilzarî sîtava xwe ji ser keviya kêlan û ji ser kîlsa xemgîn ya goristanê, dikişand”(R.177); ji “Girê Şermola, ku xweliya xwe bi ser neynika xewna (Huseynîyan) de,

dadikir”(R.144), ji “Amûdê, ku (Koçberên wê) diçûn xwê... û dara tûyê di tozê de dima”(R.138)...û ji “goristana bajêr, ku Huseynî nizanibû dê ew qasî bêriya wê bike”(R.163), helbest û helbest, hez kir. Huseynî bi kurdî, ku zimanê toz, goristan, yar, “Amûdê”, “Rono”, “Şermola”, “çarçira”, “Toros”, gula berbero, hechecik.... û kewên wî bû, çû helbestê “da ku wateya hebûna xwe ya di vê gerdûnê de, ji dest xwe wînda neke, da ku mêvandariya wî ne ew qasî bi jîyanê giran be, da ku bêsêr û şûn ber bi rexê tarî ve neçe”(R.10).

Amaje I: Hemû rûpelên ku di gewdeyê vê xwendinê de, wek çavkanî hatine destnîşankirin, ji pirtûka helbestkar in: Ehmed Huseynî: Dîwan(berhemên giştî), weşanxaneya Avesta, Istanbul, 2001

Amaje II: Ev beşek ji xwendineke dirêj e, di berhemên Ehmedê Huseynî de.

*Huseynî hewl dide ku ji pesnê û wêdetir ax, av, agir û bayên xwe yên jidestçûyî, di şîheşîha pîrsê de beşdar bike: Lewra ji agir heta bi agir „wê navên şekestî û rengtarî(ku rê ji wan diçe bîra Huseynî) geşbûna xwe bidomîn in“; ji avê heta bi avê dê nimêjkerên ku duwa û dirûze ji wan diçin aliyê destên Huseynî „nimêja xwe ya dawîn, nimêja herî dirêj di hişê lavlav û hîroyê de, li bin baskên Ferat kuta bikin“, ji baranê heta bi baranê, dê „keskesor (...) qolînca (yara Huseynî ya ji êşê) ko ji ber termê Helepçeyê mabû, ji xwe re, ji taya çîyan re, ji şevnema destê sibê re û ji çûkên malwêran yên bêrikirinê re (bike) balgeha sermedî ya maç û rengên qedaxekirî yên ala avê“; ji avê heta bi avê „av (dê her av be) û aviya goristanê belavkirî (dê di ser ve biçe); ji axê heta bi axê, dê zarokên ku rê ji navên wan diçe giriyê Huseynî, bimînîn „neviyên bê nav û paşnav, yên axa ko porê xwe ji ber derdên bûyeran spî kiriye“, û ji axê heta bi axê, dê ax her ax be û „kildankên bajar û gundan (dê) hîlbiperikin mijangên westiyayî“ R. 102,103, 104, 106,107.

Şêx Ehmedê Huseynî

Ezîz Xemcivîn

*Çi qas nûjenî danîbe jî tu carî
hilma nanê tenûrê ji bîr nekiriye...*

Tegez ez di vê gotara biçûk de nikarim
mafê Şêx Ehmedê Huseynî bidimê, lê ez ê
bi kurtî çend gotinan li ser berhemên ku
ketine destê min bipeyivim..
Dîwan, berhemên giştî: Ehmed di
helbestên xwe de bi çipikên barana
Amûdê porê xwendevanên xwe şil dike,
jiyana milletê xwe rast û durist tal û şîrîn
berçav kiriye.. tu carî Ehmed xwendevan
bernedaye tunelan û ji wan nexwestiye ku
bibin feylesof da karibin tilismên
helbestan vekin; bi hemû awayan helbest
ristiye, klasîk, terazû, nûjenî û felsefe jî bi
kar aniye..
Her pirtûkek ji pirtûkên dîwanê di nerîna
min de nexşeyek e, her helbestekê ji
helbestan hestek e, nerînek e û jiyanek
e... Lê rewanê wan bi rewanê "kewo" ve
girêdayî ye; pexşan û rist bi piştiyên pûş
re bend kirî ne... Hîn destên Ehmed li ser
kelpîçên Amûdê dilerizin...

Hîn bandora mayin û tirsê teqîna wan bi
zarok û jin û mêran de li dilê wî heye;
wilo Ehmed ew giriye dê û bavê xwe, ew
kesên gundî û bajarî, ew danê savarê ku li
destarê demê ji ber hêranê birîndar e, tîne
zimên... Ehmed xwe di ser milletê xwe re
negirtiye, xweş dizane ku barana Berlîn û
Stockholmê porê gelê wî şil nake; dizane
ku peşken heriya Amûdê li ser hestên
mirovên kurd çap bûne...

Çendîn bi çolan kevin, li şaristanên xerîb
bigerin, li avaniyên bilind li Dubey, Hon
Kong û Kuwala Lampûr binêrin, wê her
ew mezrîb û şîrîkên xaniyên Qamişlo,
Hesekê û Efrînê li ber çavên wan bin... Ev
nameya Ehmedê Huseynî ye...

Sazvan im... sazvanê biskên te me
qeyîkvan im... di derya belek de
di gerînokên avên te de
were dîlbera min!
were ji nû ve em derdan parve kin
birînen kevin bigirin
û yên nû vekin...

Li gelek cadeyan bayê bêhteng ji ser
rûyê yarê vedigerîne, nahêle ta bi ta ber bi
yara wî de biçê.. Ew yara xwe bi erzanî
nafiroşe.. Xwîn û xwêdan ew e.. birîn û
jan e.. Gelo sed Stockholm dikarin
Amûdê ji bîr bibin?!!

Ez bawer nakim ku Ehmedê Huseynî
hêsiyên dêya xwe bi çemê Renê û sîlavên
Ewropa û mija Londonê bide!! Wateya
giranbiha kolana xaçerêkên evîna welêt li
ser dilê bi hesret û xem her dem vedijîne..
Ehmed ji ser xwe neçû; helbest bi helbest,
peyv bi peyv tegez dike ku dîwarên rista
rastî bi kelpîçên Amûdê tîne avakirin..
Ew dizane beş û tîrik banê xaniyê wî
bêhtir zêft dikan...

Çi qas nûjenî danîbe jî tu carî hilma nanê
tenûrê ji bîr nekiriye.. Qet negotiye ez
Aragon im, ji ber di encamê de dibîne ku
Aragon û Beaudelaire bi wan her du sê
qitîkên biçûk li hêlîna li paş patozê, li ber
pala wî kêstekê hûrik jibîrbûyî ne wek me
bi wan hest nabin..!!



Diyar nekiriye ku ew Eflatun e û xwediye
kumarê ye; berovajî wî hemû nivîskar,
helbestkar û xwendevan beşdarî çandiniya
kulîlk û nêrgizan dike, da ku karibin bi hev
mêrg û çîmenên zimanê şîrîn geş û xweş
bikin...

Welat ku hat
tîpên xwe di êgir de ji bîr kirin
dastan bi baskên firat zencîr kirin
Welat ku hat
ewrên biharê kirin hêsir
çiya ji xewnê re kirin pêsir
Welat ku hat
birûsk ji kalanê avêt
şîrava kum û kuman mêt

.....
.....
û tu
li morîkên welêt ker û gêj bû
û welat di reşika çavên
Diyarbekirê de
gelawêj bû...
te berê xwe dayê
pinpinîk e, bi hêsrên Kurdistanê
destnimêj bû...

Nîşe: Ev nivîs di malpera
'www.tirej.com'ê
de hatiye weşandin û
ji bo dosyeyê û weşandina li ser kaxiz
ji bo kovara W hatiye hinartin.




Wek mirinê tu bi lêv dibî!

Ehmed Huseynî

Perên xwe yên ji avê
 bi ser peravên nalîna min ve vegire
 û xewnên min ji ber bike ey mirin!
 Min di terkên dijwar ên henasa xwe de veşêre
 û çavên min di bargehên vehesîna kulan de
 ber bi taristanê ve rakişîne!
 Dilê xwe bibijîne çûrisînê
 destên xwe dahêje dengvedana gazinan
 pêjnên xwe di daristana rengan de daçikîne
 da ku balindeyên tarawgehan darên peyvê
 binasin
 û rûbarên xatirxwestinê sirûdên xwe bikujin!
 De stêrkên şeva xwe ji ronahiyê rût bike
 û sibehên girî bi ser kêlên matmayînê de
 dawêşîne
 da ez û tu di bagera nemanê de
 pîjên ahengê berhev bikin
 û bangên xwînê di guhanên felekê de
 bimeyînin!
 De belgeyên xwe yên bînçikiyayî
 pêşkêşî pîtanokên heyveronê bike
 û neynikên xwe bi ser laşê min de bibarîne,
 çûkên xwe,
 bûkên xwe,
 neynûkên xwe,
 û semageriya pepûkên xwe
 ji hêlîna sînga min
 ber bi mirina rexên tirsê ve bifirîne
 û bi kurtepestike cegerdar
 ji min re bibêje ey mirin!
 Bibêje da
 pencereyên axînkêşana dayika xwe ji te re
 vekim!
 Bibêje da
 keftelefa rehan
 û tenhatiya gavan
 û velerzîna yaran
 ji gerdena te re bixemilînim!
 Bibêje
 da ku keştîyên bêzariyê hilperikin bendergehên
 te
 û melevanên tawanbar ên deryayê
 bi ser pêlên te de biqermişin!

Bibêje ey mirin!
 Efsaneyê bibêje
 Çîrokên bêrîkirinê bibêje!
 Memikên ziwa û toza şînîgiriye bibêje!
 Wek ku çawan rondikên seferê amade dikim,
 Tîrên xwe amade bike
 û ji mirina min netirse ey mirin!
 Min li wir

babelîska xwe di hêlana te de hiştiye,
 min bîna evîna xwe di hûçkên berbangê de
 parastîye
 û min bilûra xwe di goristana Amûdê de mezin
 kiriye.
 Min li wir
 di dergûşa havînê de gulgenimên giyanê xwe
 dilorandin
 Min li wir
 dîwarên şevistana kulîlkan hînî xewê dikirin
 û min xwe ji hembêza çemê êşê bernedida.
 Min, tu li wir naskirî,
 lê min xwe nedispart kêferata çekên te,
 Her li wir,
 li ser keviyên giriya bejinbilind a dayika min,
 min keziyên çolistana te bi qirçe qirça tiliyên
 oxirê dihûnandin
 û min tovên bendemanê di bîbikên tavsorkê de
 radiperandin.
 Min xwe hînî reşebayên te
 û reşgirêdana dara hinarê ya dayika xwe dikir
 û di westana ferhengan de
 li hespê nalîna xwe digeriyam.
 Hawara min
 li pey te diherikî!
 Hawara min
 di ximava xêzên te de diterikî!
 Hawara min
 di gewriya zersosina te de,
 di xuşîna negotina te de,
 di bişîrîna sotina te de ji dayik dibû
 û ji bendên talanê ber bi bendên halanê ve diçû.
 Tu hawara min hildibijêrî ey mirin!
 Wek mirinê; tu van goristanên windayî yên laşê
 min,
 ji
 gulan
 re,
 bi lêv dikî
 ey mirin!



Em ê çawa vê birînê bi hev bidin nasîn û xewnê şîrove bikin?

Mem Mîrxan

Rojekê ji rojan, em li helbestkarekî digeriyan, ji bo ku em bikaribin derbasî gernameya birînên kurdî û helbesta kurdî bibin. Em di bendera peyvan de, di nav rêzikên helbestan de, di nav rûpelên

kovar, rojname û pirtûkan de lê digeriyan. Digotin yekî porhinçik û porê xwe di paş de girê dide, kumê ku li serî ye tim xwar e, çavên wî wekî tariya dîroka jibîrbûyî ronî dikin, diçûrisin. Me bêjîng bi bêjîng peyv li dû xwe hiştin û di dawîya wê geryanê û rojek ji rojên payîza biharê de li Amedê, li ber cihê ku Şêx Seîdê kal lê hatibû daleqandin, yanê li meydana Selehedînê Eyûbî, rastî Ferhenga Helbesta Kurdî Şêx Ehmedê Huseynî hatin. Berî ku bibêje hûn çawan in got: “Heyran em ê çawa vê birînê bi hev bidin nasîn û xewnê şîrove bikin?” Û êdî peyvê berê xwe da aliyekî din, aliyekî pir birîndar, aliyekî ku serê sed salî ye di bin zextên nalîn, keser û birînan de maye û ji bo jiyanê ji xwe re li rêçekê digere.

Ehmed Huseynî li pey wê xewnê ye. Li pey lerizîn û guvaştin û mirina wê xewna



cegerdar e. Li pey xewna zimanê jibîrbûyî ye. Ev zimanê ku di tarî û toza dîrokê de winda bûye û li çarenûsa ku ev ziman dê çawa ji vê gemarê paqij bibe, digere. Û tim di bin gulebarana pirsan de ye: “Gelo em ji ku hatine? Em çawan dikarin bibin endamê vê gerdûna ku bi hezaran gel, çand, ziman, nav û reng tê de ne? Her wiha me jî bi xwe re dikişîne nava per û baskên pirsan: “Ma em ê vî miletî wiha bihêlin û bi tenê li rehên zimên û li wateya helbestê bigerin? An em ê vî miletî vebibêjin û bi alîkariya helbest û kurmançiya birîndar xewna xwe pêk bînin...” Ehmed Huseynî pişavtin û asîmîlasyonê, zarokatiya di bin zext û êrîşên peyv û



zimanê biyanî de mayî, dadirizîne. Ew zarokên ku ji tirsan solên xwe derdixînin û derbasî pola dibistanê dibin û rastî gerdûna peyvên tarî tên. Gerdûneke ku ne ew ji me fêr dike ne em ji wê fêr dikin. Gotinên diya me, navên berxê me, zozanê me, kevçî û şorbenîska me di heman roje de bermeqlûb dibin. Hemû peyvên çavbirçî êrîşî peyv û gotinên diya me dikin. Û di wê hûtdemê de peyvên serdestan serê peyvên diya me dixwin û me ji xewna me dûr dixin. Di wê qonaxê de êdî ji me re dibêjin: “Zimanê herî şîrîn ê me ye, gulên herî xweşik li welatê me vedibin, dîroka me ya herî mirovane ye, em ne dizanin xelkê bikujin û ne jî dizanin daristanan bişewitînin.” Dibêjin; “Dar û devî, havîngeh û seyrangeh, zozan û spehîbûna xwezayê bi giştî li ba me ne.” Em jî zarok in. Em jî dibêjin, nexwe divê em ji van mirovan û ji zimanê wan hez bikin. Piştî li cihekî, li qonaxeke dîtir, li ber tîlên rêsayî yên welatê mayînan, li welatê goristana bînavnîşan, em li zimanê xwe yî jibîrbûyî û li dîroka xwe ya jibîrbûyî dilikumin û em ji hev re dibêjin: “Ew çîrokên ku ji me re digotin, giş derew in.” De îcar gerek em wan hestên ku serdestan di giyanê me de çikandine, gaveke zûtir bikişînin û bikaribin riyekê li ber hestên xwe, xewn û xeyalên xwe yên birîndar vekin. Ku hewara me karibe pê de biçe. Divê em ji zimanê xwe hez bikin. Çawan tê gotin ku “mîrovekî ji sergînekê hez kiriye û çil salî di ber sînga xwe de newandiya,” divê em jî hewara xwe hembêz bikin. Û em digihên qonaxeke nû. Êdî em pir hindik hînî kurdî bûne, heta pê helbestan û çîrokan dinivîsînin.

Ehmed Huseynî di vê qonaxê de dîsa ji me dipirse: “Baş e tu bûyî nivîskar û dawî?

Ku tu yê wek axaftina gel binivîsînî, hewce nake tu binivîsînî. Divê tu asoyên dîtir li ber vî zimanê vekî da ku karibe di nav esmanê zimanê dinyayê de wek zimanekî edebî bikaribe pîkolan bide xwe. Ji bo wê jî divê tu serdestî zimanê xwe bî.” Dîsa ji bo helbest û helbestkaran gotinên zêrîn dibêje: “Helbest û helbestkar giyanê neteweyekê ne. Hemû peyvên di zimên de tên bikaranîn; raman, bîr, kesayetî, dîrok, felsefe, rewîşt û gerdîş, sinc û gewil, rabûn û rûniştina neteweyê, bi zimanê wê neteweyê ne û helbest jî spehîtiya bikaranîna wî zimanê ye.”

Wekî me li jor jî got, Ehmed Huseynî ne li pey peyvên ji rêzê ye. Tîm û tîm kertek û radeyek bilindtir li ber xwe dihêle. Ji ber wê ye ku gelek kes dibêjin zimanê wî giran e.

Lê ku mirov lê dinihêre di zimanê wî de: Stêrkên birîndar li bin guhê hev dikevin Helbestên barana tirsokî,

Çend êvarên bi tirs,
Çend çavên bi pirs li ser şaxên xwîna me têr dibin.

Dema Cûdî diponije,
Zarok navên xwe, rojçêbûnên xwe diçirînin.

Li Hekarê yezdanê pak û dilzarokî
Xwedanê not û neh navên fediyokî dikeve serê dîlanê.

Ji bo Zekiye Alkan şev şînan şîn dîkin.
Û welat şehîdan di tava rojê de rêz dike.
Û gurz bi gurz çîçek û sorgulan didin ber pozê jîyanê.

Û welat di reşikên çavên Diyarbekirê de dibe gelawêj.

Bi tîrêjên berbangê re
Welat dibe çar parçe,
Nivê axîna me li binxetê dimîne
Em bar dîkin.....

Xwedan stûxwar dibe

Em bar dîkin.....

Aras xembar dibe

Em bar dîkin.....

Gerdûn gemar dibe

Em bar dîkin.....

Jiyan tamsar dibe.

Û rêwî tên

Teyrê berate yê ku roj li nîvro fêrî goştê me bûye

Kon vedigire li dor birînen me/Em dibin ardûyê şoreşê.

Û êdî dengê me birîndar e wek welatê birînan

Li welatê goristanên bînavnîşan

Em tiliyên xwe bi kezerê hine dîkin.

Helbestên me têra giriyê me,

Û sînga me têra hembêzkirina êşên me nake

Û

Em wekî pezkoviyên li deşta dîrokê diçêrin

Û

Robarên Mezopotamya mîna pelên payîzê ji dara xewnên me diweşin.

Û em ji Ferhenga Helbesta Kurdî peyvên jîyanê bêjing dîkin.

Nîşe: Ev nivîs ji bo pêşgotina pirtûka Ehmed Huseynî ya bi navê “Çend Dîmenên Xemgîn Ên Kurmanciya Nivîskî” hatiye nivîsandin.



Qutbê Helbestê

Adar Jiyan

Wekî ku gelek helbestkarên navdar jî dibêjin ku “Beriya helbestê tiştek tunebû...” Dibêjim qey rastiyeke vê gotinê heye. Lewra piştî ku ez digel hin helbestkarên demê, nasdarî Ehmed Huseynî bûm, qinyateke wisa bi min re çêbû, ku tiştek berî helbestê tunebû; û dê piştî wî tunebe jî...

Lamartine jî dibêje “Helbest, xewnên jîrîtiya mirov e.”


Ev gotin jî pir bi min xweş tê.

Mebesta min ne ew e ku ez Ehmed Huseynî derxim mertebeya peyamberiyê yan jî têkilî karekî ku ne karê min û barekî ku ne barê min be, bibim. Jixwe ne hedê min e jî. Ez ê tenê, wekî hezkiriyekî helbestê û nemaze jî hijmetkarê helbesta Ehmed Huseynî, hin hest û hizrên xwe yên acîzane derbibirim.

Dibe ku sîfatê peyamber û feylesofekî ji bo Ehmed Huseynî ji hêla hin kesan ve, hinekî giran were dîtin; belê qene ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku Ehmed Huseynî, yek ji qutbê helbesta kurdî ya nûjen (îroyîn) e.

Belê divê neyê jîbîrîkirin ku hemû peyamber mirov û hin peyamber jî helbestkar bûne. Bi vê hincetê mirov dikare bi hêsanî bibêje ku helbestkarekî baş, di çapa xwe bi qasî feylesofekî feylesof û bi qasî pêxemberekî jî peyamber e.





Îcar berî ku der barê Ehmedê Huseynî de hin tiştan bibêjim, li min negirin belê, dûrî gotina wê dixwazim der barê helbestkariyê de çend gotinan ji xwe berdîm.

Helbestkar, pêşî wekî zarokekî/e ku nû bi zimên bikeve, çi tê ber devê wî/wê dibêje. Gava ku bi wî zimanê xwe yî nîvgulxe (nîvco) diaxive pêşî, gotinên ku her kes jê fêm dike, dike. Hin bi hin balix dibe û gotinên ku hin kes jê fêm dikin û hin kes jê fêm nakin li hebana peyvên xwe zêde dike. Peyre peyre jî kamil dibe û gelek gotinên ku tu kes jê fêm nake ji xwe berdide... Jixwe wê çaxê malik lê wêran dibe û wekî dîn û şêtikê/a civatê/civakê tê dîtin û qebûlîkirin êdî. Zêde civak guh nade gotinên wî/wê yên bêmane, eletewş û jisêrêder (!) Belê ji çend kesên wekî wî/wê yên xurîfî û jirêderketî pê ve(!)

Wekî ku li jor jî hate diyarkirin, heyamên ku helbestkar derbas dike dişîbin merhaleyên temenê mirov.

Ji ber ku di merhaleya zaroktiya helbestkar de her kes jî gotinên (ristên) wî/wê fêm dike, her wisan her kes pesnê wî/wê jî dide û pê difire. Di merhaleya ciwaniya wî/wê ya ku hin kes jê fêm dikin û hin kes jê fêm nakin de, yên ku fêm dikin pesnê wî/wê didin û wê/wê radigihînin heft tebeqeyên asîman. Û yên ku jê fêm nakin jî sixêf û kufriyan bi ser de dibarînin û wî/wê dadixin bin heft tebek erd û esfelesaafilîn (derenceya herî jêr û serberjêr) Îcar gava ku digihîje merhaleya stewîn û kamilbûnê ya ku tu kes jê fêm nake, dibe nehîlet û lenetiyê/a civatê û yekcar tê çîçozkirin (afarozkirin) û recimkirin. Heke ku neyê recimandin jî teqez an dê were qewitandin û sirgûnkirin an jî tecrîdkirin û heramkirin.

Îcar ji ber ku cih û war jê re namîne; neçar e ku xwe li cih û warekî ku bikaribe lê bistire û bidebire, digire. Lê wê çaxê jî li ser rûyê dinê tikûtenî dimîne... Heke bikaribe xwe li ser piyan bigire, dê per û bask lê bigihên û xwe bi xwe bi firê bikeve. Wê

gavê jî teqez dê ji mirovan bireve, terkedinya bibe û her û here. An dê wekî Zatê Îsa, Xwedayê Diloan wî hilde erş û asîmanê xwe; an jî dê wekî Cenabê Mihemed, erda Xwedê lê bê hev û di şikeft û berqefkên nepenî de bibe şayanî qasidekî dilsoz û pêxemberiyê.

Peyamber, ramanwer û helbestkar... Hersê jî hem danîstiyên silûkê û hem jî mîratgirên silûkê ne. Heta ku ew xwe ji hest û hizrên civatê/civakê pak nekên, xislet û xisûsiyetên peyamberî, ramanwerî û helbestkariyê bi wan re peyde nabe.

Ramanwerê/a ku rasteqîniya civakê li gorî hiş û têgihiştina xwe, rave û şîrove dike; tê dardekirin û şewitandin. Pêxemberê ku qasidîtiya Xwedayê xwe dide ser xwe, alemekê bi pey xwe dixê; berdêla wê çarmîxkirin, serjêkirin û koçberkirin e. Belê helbestkarê/a ku tenê gotineke negotî dike; dibe sedema jinavxweavêtin, tecrîtîkirin, vederkirin, heramkirin û silavlênêkirina civakê.

Gava ku mirov ji zimanê helbestvên (ji hizr û zîkrê wî) fêm neke, teqez dê xwe li bextê heyîn û heyberên derîmîrov û civatê bigire. An dê wekî ramanwerekî/ê bikeve xelwet û silûsê (tenêtî û tenhayiyê) an jî wekî derwêş û peyamberekî, bikeve silûkê (çîlexaneya ku sofî û derwêş, çil rojê tê de zîkrê Xwedê dikin)

Silûk û silûs her du jî, hem ji bo hizr û ramana feylesofekî/ê û hem jî ji bo wehî û peyamên peyamberekî asêgeheke qewî ye. Û tu kes nikare wê asêgehê hilweşîne yan birûxîne. Îcar ji bo ramanwerekî/ê silûs û ji bo peyamberekî jî silûk çî be, ji bo helbestkarekî/ê jî helbest ew e. Ango helbest asêgeha helbestkar/helbestkara/ê ya herî berz û bilind e. Û tu kes nikare xwe bigihîne wê asêgeha asê û wê zû bi zû bîne xwarê.

Her wiha silûk û silûs her du jî ji bo aramî û bextewariya civakê jî du deriyên xêrê ne. Silûs, ji bo feylosofê stargeh ji bo peyamberekî wehîgeh û ji bo helbesvanekî/ê jî aramgeh e... Belê divê silûs û silûk, her gav wekî quncikeke nepenî (şikefteke tarî yan berqefkeke asê) neyê sêwirandin. Lewra ew gelek caran di dil û mêjiyê mirovên ku ji bo mirovahiyê têdikoşin arasteyî bêgunehiyê dibin de jî, ava dibin. Ji bo wê jî hewcetî bi tecrîd û tenêtiya civakî heye. Belê ev tenêtî û jêbidûrketin, ne bidûrketineke bedenî ye; bidûrketineke dilînî û giyanî ye. Yanê helbestkar neçar e ku bi ruhê xwe ji civakê îzole bibe û veqete.

Çi ramanwer û peyamber dibe û çî jî helbestkar dibe, heta ku nekeve xelwet û silûkê, nikare xwe ji dehb û feqîkên civakê reha bike. Ew dehba ku gacik bi gacik li dora wî/wê tê pêçan, dibe sedema piştperdebûna wî/wê jî. Di pişt wê perdeya ku di navbera wî/wê û civakê de hatiye danîn de, xwe şilftazî dike; dil û mêjiyê xwe derxûn dike û hest û hizrên xwe yên bêcil diavêje ser civakê. Rev û jêbidûrketina civakê ya ji helbestvên jî ji ber vê rûtî û rastgotiniya wî/wê ye. Îro Ehmed Huseynî jî vê yekê dike.

Rast e. Gelek caran dike ku tu kes jê fêm neke. Bi ya min qenc û xweş dike. Ma ew kesê/a ku ji helbesta Ehmed Huseynî fêm neke û jê netehmije, çî hewcedariya wî/wê bi ecibandin û neecibandina helbesta Ehmed Huseynî heye? Jixwe heta ku Ehmed Huseynî û yên wekî wî, xwe radigihînin derinceya ku her kes ji wan fêm neke, çavê şeytên dirije. Îcar dê çima xwe di wê kozika ku her kes (gelo kesên çawa) jê fêm dike de biesirîne?

Dibe ku Ehmed Huseynî jî, wekî hemû peyamber û ramnawerên qirnê dawî, ligel ku ji bo dahatû û aramiya civakê têdikoşe jî, hin bi hin xwe ji civakê bike û jê bi dûr bikeve (ji hêla derûnî û hizrî ve). Û dixuye ku dê civak jî ji bo ku di diwarojê de lê bigere, hin bi hin jê bi dûr bikeve. Lewra gelek civatên ku bi saxî gora helbestkar, zanyar û ramanwerên xwe dikolin, piştî mirina wan qubeyekê li ser gora wan ava dikan, hene. Berevajî wê, hin civakên famkor û nankor ku tu kes li kêlika zanyar û helbestkarê wan rast neyê jî, hene. Belê em hêvîdar in ku dê civaka me, Ehmed Huseyniyê xwe, qet ji bîr neke.

Îcar gelo dê Ehmed Huseynî jî wekî gelek helbestkar, ramanwer û peyamberên demên borî, ji neçarî rabe deng li peyrew û nîfşê dema bê bike, an neke?!

Belê digel hemû nirxandin, pesinandin, rexneyên di cih de û ne di cih de, divê baş bête zanîn (baş tê zanîn) ku Ehmed Huseynî bi kurdî difikire, bi kurdî diaxive û bi kurdî dinivîse... Û ew, ne bi erebî, ne bi farisî (ji xwe bi tirkî nizane) ne bi inglîzî, ne jî bi fransî dirêse/dinivîse. Ew, seranser bi kurdî dinivîse. Û mimkûn e ku dê ji her kesî bêhtir mirovên kurd (belê yên ku bi kurdî dizanin) jê fêhm bikin.

Mirov di helbesta Ehmed Huseynî de dîsa li Ehmed Huseynî digere. Yanê mirov dike nake hevrik û hinkûfekî jê re nabîne. Jixwe divê ku hinkûf ji helbestvên re tunebe. Lewra tu helbestkar naşibe helbestkarekî/e din. Her helbestkarek cîhaneke cuda ye. Û bi awa û şêwaza xwe ya rengîn derdikeve qada cihanê û xwe çêlî mirovan dike.

Helbesthez dibe helbestkar dibe, ew kesên ku hevnasiyê bidin Ehmed Huseynî, teqez dê ew û Ehmed Huseynî zû bi zû ji hev negerin û neqetin. Lewra Ehmed Huseynî li tu deran nahewe û natebite. Bi hest, best û helwesta xwe ya bîefsûn mirov tehrîk dike û li pey xwe dikişkişîne. Gotinên negotî dike. Tiştê nemayê tîne serê mirov. Mîratgirê rencûr û zehmetiyên bêtebat e. Heta ku tevliheviyê dernexe debara wî nabe. Bengî ye. Bargirê eşq û evînê ye. Ligel êşê û li eşqê jî digere. Haveynê helbesta wî eş û eşq e. Agir e, şewt û şewat e. Tîraf e. Pîzot e... Wekî dolapreşeke ezmûndar, li ber dolaba eş û azarên demê kab dide û derd û xemên me gilok bi gilok dirêse. Ne westan û rawestan lê heye û jî navber û hedan... Di tu derê de hîlnayê. Di helbestê de jî...

Min bi xwe, helbestkarekî/e ku bikaribe bi qasî Ehmed Huseynî hevсарê helbesta xwe, bi wêrekî ji destê xwe berde û wêrîbe qet bi pey wê nekeve, nedîtiye û ne jî bihîstîye. Ji ber ku xwe û helbesta xwe ewle ye.

Tiştê ku reng, deng û taybetiyeke cuda dide helbesta wî jî ev xislet û xisûsiyetên wî yên awarte û jirêzêder in. Heke ne wisa bûya, dê her helbestkar wekî Ehmed Huseynî bihata dîtin an jî dê Ehmed Huseynî wekî her helbestkarî/ê...

Û dê îro me yê nekaribûya behsa resenî û cihêrengiya helbesta wî bikira û ne jî ew wekî “qutbê helbestê” bi nav bikira.

